

BERBĀNG

BIJİ YEKÊTİY

WELATPARÊZANI KURDISTAN

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANË LI SWËD

NAVEROK

Pîrsa Kurdistanê.....	3
Xebata Federasyonê.....	5
Amerika hêzên xwe li Kurdistanê bî ci dike!.....	6
Dî warê parastina zmên de.....	9
Kurtenivisarek li ser diroka zmanê kurdi yê nîvisandi.....	10
Zaravên me û zmanê nîvisandi.....	12
Namên xwendevanan.....	15
Boyaxçiyê solan(çirok).....	17
Helbest.....	20
Mendalê Mamoste.....	21
Xaçerêz.....	22

○

Berpîrsiyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxistina Nîvisaran
SEYRAN Û GULBAHAR

○

BERBANG

Kurdisk tidskrift - Utges av kurdiska Riksförbundet - Ansvarig utg./ redaktör A. Riza Alan - Layout A. M. Gilly - Sättning Seyran och Gulbahar -

ADRESS

Kurdiska Riksförbundet, Sveav. 135, 113 46 Stockholm
Tel : 08 / 33 07 09

Prenumeration: Medlemmar 50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.

XWENDEVANÊN BEREZ

Mixabın ev hejmara Berbangê ji dê dereng bigihê we. Sodemên vê derengmayinê gelek in; em nikarin hemûyan di vi rûpeli de bihejmérin. Lê bila tu şika we tune be, ku em bî hemû hêza xwe xebitine – û emê bixebeitin – ku kovarê dî serê her mehê de bigihin we.

Nîvisara me ya yekem, pêşniyarnama Partiya Çep a Komunist (VPK), a li ser Kurdistanê ye û ji protokolên Parlamentoya Swêd hatiye deranin. Em dî vê hejmarê de, bî navê " Mendalê Mamoste " rûpeleke nu vedikin. Ev beş dê tim dom bîke. Bî çiroka Fırat Cewheri em cara yekem cih didin çirokeke modern. Emê dî hejmarên pêş de ji ci bîdm çirokêne weha.

Wek ku me dî hejmarên bori de ji nîvisandibû; em bî tu awayi têkili zimanê nîviskarên xwe nebûne. Wan çawa nîvisandibe, me wulo çap kiriye.

Xwendevanê me ji me re dînîvisinin û abonêne me roj bî roj bêtur dibin. Ev baldari dilê me şad dike. Bî hêviya domâmina van peywendiyen, em spasi xwendevanê xwe dikin. Bî rasti tûstê ku kovarekê vedijine, peywendiyen bî vi rengi ne. Em ji nîviskar û ronakbirêne Kurd ji gelek nîvisar dîgrin. Lê dîgel vê yeke, hînek nîviskarên ku me ew yek-bîyek vexwendibûn (dawet kırın) bêdeng dîminin. Gelo tu tişteki wan,ê ku bikarîbin bî wesita kovareke ku organa 17 komelan e; ji xwendevanan re bêjin tune ye ?

Bî Gramê Me
BERBANG

BERBANG

NAVNISAN

Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê : 50 Kron, 30 DM.

Kurdiska Riksförbundet, Sveavägen. 135, 113 46 Stockholm/Sweden. Tel. 08/330709 Postgiro : 64 38 80 — 8

PIRSA KURDISTANÊ

OSVALD SÖDERQVIST CAREKÊ DIN
PIRSA GELE ME ANI PARLAMENTOYA SWËD

*PARLAMENTERÊ PARTIYA CEP A KOMUNIST (VPK) OSVALD SÖ -
DERQVIST, DI 24/11/1982' YAN DE PÊŞNIYARNAMEKE ANI PARLA -
MENTOYA SWËD. SÖDERQVIST, DI PÊŞNIYAR NAMA XWE DE REW -
ŞA GELE KURDISTANÊ DIYAR DIKE U LI HUKÜMETA SWËD DOZ
DIKE KU »PIRSA KURDAN» BIBE KOMA NETEWAN (K. N) . EM VÊ
PÊŞNIYARNAME, TEVI BERSIV Û BIRYARÊ PARLAMENTOYÊ JI
SWEDI BI KURTEBIRI WERDINGERİNIN KURDİ*

OSVALD SÖDEROVIST (VPK) :

Xanîma serek! Sê sal beri niha VPK cara yekem bî riya pîrsnamekê pîrsa Kurdan anî parlamentoya Swed. Wek ku dî rapora wezareta kar û barên derve de ji tê diyar kîrin; dî nav van her sê salêñ bori de me şopa pîrsname xwe bî pîrs û pêşniyareñ nû ajot. Dema me lî ser doza Kurdan dest bî axaftinê kîr, dî gotinan de me bersivêñ gelek erini (positiv) wergirt. Raporêñ wezaretê yên di vê xususê de û râberizinêñ herdu salêñ dawießkere râberi me dîkin ku dî gotinê de her kes bî me re bûye.

Ez bawer im van râberizinan, derheq gelê Kurd, sertêñ jiyanâ wi ya dijwar û stemdariya ku lî hemû welatan lî wan dibe, zanina me bêtir kîr. Bî rasti em vê carê dî pêşniyara xwe de tenê lî ser Tirkîyê, Iraçê û Iranê mijul nebûne. Kurd lî gelek welatên din ji hene: Lî Suriye, lî Libnanê û hejmareke hindik lî Sovyetê.

Wek me berê ji gelek caran gotiye,

Kurd bî hejmara xwe ya neziki 20 milyoni — hejmaren ku di vê xususê de têñ dayin piçeki ji hev cihê ne. Lî bî pirani lî dorûbera 20 milyoni ne — Ci-yê xwe dî navgrûben gelan ên mezin de digrin. Digel vê hejmara mezin, gelê Kurd, dî râberzinêñ navnetewi de tim hatiye — dixwazim binê vê peyvikê(kelime) xêz bikim — ji bir kîrin. Dî gel ku Kurd bî awaki bê hempa bindest û stembar bûne.

Berînîha bî çend deqîqa em lî ser Tirkîyê peyîvin. Piraniya Kurdan lî wê der dijin. Kurd, lî Tirkîyê e3eliyetek e(a-zînlik-minorty) büçük ninin, eqeliyeteke gelek mezin pektinîn. Kurd, ji şerê cihanê yê yekemin, ji dema ku İmparatoriya Osmaniyan ji hev ket û vir de, lî Tirkîyê dî bin hîncîkandin û zordesitiyeke nebihisti de dijin. Dî nav Kurdan de, jenosida(katliam) heri mezin ji aliye Kemal Ataturk ve, lî dor 1955'an hat kîrin.

Yani derheq Kurdan de zanina me niha piçek bêtir buye. Du sal beri niha rapora vezaretê rewşa Kurdan bî awaki gelek rast pêşkêş kîr. Ji hingê vir de

mesele di rojnaman de u dî râberzinêñ gelemperi(umumi) de bî awaki ji berê gelek çêtir tê peyîvin.

Lî dema em vegeñ ser alikariye berbicav (muşexes,somut) hiç tiştek ji nebüye. Lew re me pêşniyara xwe ji nu ve ani. Em ê dî çileya paşin de careke din binin. Wek ku me dî pêşniyara xwe ya iasal de u yen bori de ji got; Pêşveçûnen nu lî Rojawayê Asyayê şertê cihanê ji bo gelê Kurd girantîr kîrine. Bî hatîna cunta leşkeri lî Tirkîyê, zordesitiya lî ser Kurda bêtir buye. Dî peyva xwe ya beri de, dema ku me lî ser Tirkîyê munaqše kir, ez derheq mehke-mê kitlewi yen lî Diyarbekrê mijul bûm. Nêziki tevayıya kesen ku lî Rojhilatê Tirkîyê mehkeme dibin Kurd in —ji ber ku lî Rojhilatê Tirkîyê Kurd piraniya gel pêk tinin. Hemû xebatên wan ê dî riya parastina şexsiyeta xwe ya netewi de u ji bo bikaranina zmanê xwe û hwd. têñ pelçiçandin. Rewş ne tenê lî Tirkîyê wiha ye. Dijitiya nav lîraq û Iranê, lî herdu aliyen sinorêñ nav herdu dewletan rewşa Kurdan gelek nexweştir kîriye. Rejima Iranê dî nav lej de lejeki ji lî diji Gelê Kurd dîke.

Rewşa li Iraqê ji bî vi rengi ye. Li Lubnan u Suriye rewş piçeki çêtir e.

Em niha, wek cara berê, disa vedige-rin serê mesele. Em, parlamenterên VPK, bî van axaftinen positiv yên derheq Kurdan de këfxweş in. Û em kef-xweş in ku hun vê carê bî şelekê vekiri û zelal-bei çiv û manevara— amade ne ku zordestiya li ser Gelê Kurd mah-kum bikin.

Lê em disa ji dixwazin ku em vê pîr-sê bibin komisyonma mafen mirovi ya K.N. Li ser vê yekê gelek hat axaftin û problematika berê carekê din hatiye ber me. Piraniya mirovén vezaretê dibêjin ku eger di K.N. de piştgiriyeke xurt neye stend; ev pêşniyar wê ji ka-re bêtir zîrarê bine. Bi baweriya mîn-rewşa Tirkiyê, ku beri niha li ser axi-fin, ne têde— ev ditin rast e. Dibe ku pêkanina piştgiriyeke navnetewi li gel gelê Kurd hînek dijwar be.

Lê digel vê yekê ez dixwazim disa bêjim ku ev nabe sedemê ku em pêşni-yarê nebin K.N. Parlamentoya Swêd di Dunê de parlementoya yekemin bû ku li ser vê pîr-sê axifi. Vê yekê bala her-kesi kişand. Xebatêni bi rengi—ku ez bawerim wê bigihen neticeke— di parlementoya Norweçê de ji dibin. Li Ingilistane ji, grûbek ji bo parastina daxwazêni gelê Kurd xebatake tund di-meşine. Lew re em bawer in peşniyara me ya ji bo ku Swêd doza Kurdan bibe komisyonma mafen mirovi ya K.N., di dereca heri bilind e aktuel e.

Heke Swêd vê insiyatifê bixe destê xwe, wê ji aliyê piştgirtiya navnetewi ve bibe xwedi rometeke bilind. Di vê riskê bas ve vegerandina peşniyare ne-be sedemê ku Swêd dev ji vê insiyatifê berde. Divê em dev ji vê pîr-sê bernedin û munqaşa derheq zîlma ku li Kurda-tên kîrin tim zinde bîhêlin. Û divê wek ku pêşneyara VPK dixwaze, em vê pîr-sê bibin meqâmê yekem û bi tenê, yani KN.

Hemu réxistinêni Kurdan — yên li welat û derveyê welat, yên li Ewrupa Rojava, bî taybeti li Almanya Rojava û Swêd, yên li welatêni ku xwediye gelek parti û réxistinêni cürecûr ku mafen mirovi diparêzin, multeciyan Kurd bî bi taybeti ji Kurdistana Tirkîye ku hejmara wan li Swêd roj bi roj zêde dibe— dixwazin ku Swêd zordestiya li ser Kurdan ji hemû dewletan re roni bîke. Di vê pîr-sê de bibe xwediye insiyati-ve û seri bîkşine.

Xanîma serek! Ez dixwazim peşni yara bêt qebûl kîrin.

SÖREN HAGGROTH (SOSYAL DEMOKRA) :

Xanîma serek! Raberizina me ya vê sibê, ya derheq mafen mirovi li gelek heremêne dunê, tablokê dramatik anî raste.

Pêşniyara li ser Kurdan ji bo weza-retê ne pêşniyarekê nû ye. Di herdû civinen dawi ên parlamentoye de, we-zareta me bî van pêşniyaran gelek mi-jûl bû. Di van civinan de rewşa Kurdan li Tirkiyê, Iraqê, Iranê, Suriyê, Sovyestistanê û Lubnanê bî awaki zelal û vekiri pêşkêş kîr.

Wezaretê, di rapora xwe ya 1981/82 : 7 de, ku ditinen xwediye pêşniyare

cihanê mahkûm dikin, divê em zîlma ku li Kurdan tê kîrin ji mahkûm bikin.

Li gor deklarasyonê niha û yên ber-re, ji bo paş ve vegerandina daxwaza yekem ku di peşniyare de tê pêşkêş kîrin, tu sedemek nine.

Xanîma serek! derheq aktualizekirina pîrsa Kurdan, ji bo parlamentooyê tu sedemek niha tune. Pêşniyar dixwaze dixwaze ku em vê pîr-sê bibin Komis-yona mafen Mirovi ya Koma Netewan. Em berê ji li parlamentooyê de li ser vê pêşniyare peyiwine. Û parlamentooyê vê pêşniyare paş ve vegerandiye.

Wezaret pekanina piştgiriyeke navnetewi ji bo eqelliyetê aktuel, pîrseke gi-ring dibine, ciyawaziya (ferq) di nav xwediye pêşniyare u wezaretê de, di rî û metodêne xebatê de peyda dibe.



Parlamentere VPK, Oswald SÖDERQVIST

yên derheq zîlma û zordestiya ku li ge-lek welatan li Kurdan dibe, rast dibine. Lê divê bêt zanin ku rewşa Kurdan li her şes welatêni ku me li jor hejmart ne wek hev e. Wek ku xwediye pêş-niyyare ji diyar dike, hînek faktoren ku vê dawîye peyda bûne, — derba-leşkeri li Tirkiyê, şoreşa Iranê, leja nav Iran û Iraqê — şertê jiyanê ji bo Kur-dan xîrabtir kîrine.

Ditina wezaretê ev e ; divê em rewşa Kurdan bisopinin (taqîb bikin) û ma-fen wan ên siyasi û çandi biparêzin, u û çawa ku em zîlma li ser gelên din ên

Daxwaz, rîndkirina pozisyonâ Kurdan e. Ditina wezaretê berê ji hatiye pêşkêş kîrin. Eger em vê pîrse, bî ku em bîserkevin, bibin Koma Netewan, neti-ca vê dikare zîrarê bigihine Kurdan bi xwe. Divê di her rewsekê taybeti de, hukûmet li gor wê rewşê, ji bo pozis-yonekê taybeti bîryar wergire. Lew re ez dixwazim ku ditina wezaretê bêt qebûl kîrin.

Dawîya raberizinê hat.

Pêşniyar, bî 270 dengen li dij û bi 18 dengen li gel û bi bêdengmayina Bertil Mabring berperc drayewe(hat red kîrdin)

XEBATA FEDERASYONÊ

CIVINA FEDERASYONÊN BIYANIYAN



Thord Palmlund

Roja 4-5 ê Mijdarê, 1982, civinek mezîn dî navbêra nûnerên Federasyonê Biyaniyan û Daire ya Dewletê Biyaniyan (Statens invandrarverk) pêk hat. Ev cîvin ji aliye SIV (Daire ya Dewletê Biyaniyan) ve hatibû amade kirin. Her sal 2 car cîvinên wisa têن pêkanîn. Dî van cîvinan de ji her federasyoneke biyani nûnererek tê vexwendin. Û çend nûnerên SIV û wek dün ji gelek nûnerên ji hin meqamên Swêdi, wek SÖ (Serokratiya Dibistanan) nûnerên rojnamen Swêdi, TV û radioyê û.h.w. di cîvinê da bejdar dibin. Ji federasyona komelên Kurdistanê ji hevalek li ser navê Komita Karger li vê cîvîne besdar bû.

Cîvina 4-5 ê Mijdarê ji wek cîvinê berê, bî vekirina serokê SIV dest pê kir. Serokê SIV, Tord Palmlund, bî tevayî li ser rewşa biyaniyan sekini û li ser rewşa dawi informasyon da. Palmlund, di axaftina xwe da, behsa hatina hukumeta nuh ya Sosyaldemokrat kir û got; ku hukumeta nuh di siyaseta xwe ya li ser biya-

niyan de dê hin destvekiri be. Û li ser mafê dengdanê ji bo biyaniyan, di hilbijartina parlamentooyê da ji xebata wezira biyaniyan, Anita Gradin, bî tevayî hat şorkirin. Palmlund, li ser rewşa dawi ku li Swêd wek temayulek li hember biyaniyan peyda bûye, şor kir û ji bo rawestina li hember xebatênil jîdiperest de xebatênil çawa pêwist bin, ditinênen xwe û ya SIV'ê got. Dî vi wari de ji hemû federasyonê biyaniyan alikari xwest.

Cîvin 2 rojan ajot. Hemû nûnerên federasyonan ditin û baweriyênen xwe li ser van probleman û problemen wek din pêşkêş kirin.

Nûnerên federasyona komelên Kurdistan, di axaftina xwe da li ser Kurdistanê bî kurti informasyon da. Li ser rewşa kurdêni siyasi ku wek multeci tên Swêd, ji informasyonek fire da. Nemaze hatina kurdêni Kurdistana Iraq ê (mehêni dawi) mineqeşe vekir. Nûnerê SIV, Palmlund, li ser vê meselê ditinênen xwe got û hatina kurdêni Kurdistana Iraqê wek bûyerék neyini pêşkêş kir. Li ser vê yeke, nûnerê federasyona komelên Kurdistanê ji, ditina federasyonê li ser vê meselê û bî tevayî pêşkêş kir.

Cîvin, bî tevayî baş derbas bû. Roja 2'ya, piştî ku herkes bir û baweriyênen xwe li ser meselên biyaniyan dûr û di-rej vekirin, dawiya cîvinê hat.

CIVINA FEDERASYONÊ BI SEROKÊ SIV RE



Malbatek multeci ji Kurdêni Kurdistana Iraqê

Roja 5'ê Mijdarê, li ser navê komita karger 3 nûnerên federasyonê li Palmlund re besdari civinek resmi bûn.

Cîvin li ser xwestina federasyonê pêk hatibû û li ser rweşa kurdêni Kurdistana Iraq ê ku wek multeciyan siyasi tên Swêd, bû.

Wek tê zanin, di rojêni dawi de, di rojnamen Swêdi da, ji bo kurdan gelek tiştên ne baş hatin nivisandin. Û li ser hatina wan wek multeciyan siyasi di rojnaman de gelek tişt hatin nivisandin. Van tiştên çewt û xirab ku di rojnameen Swêdi de derketibûn, van informasyonan ji SIV (Daire ya Dewletê Biyaniyan) girtibûn.

SIV, bi xwe li ser vê meselê ditinênen xwe bi awaki neyini beyan kînbû. Lew re, fûmete

multeciyan kurd, di çavêni civata Swêd de daxistibû.

Nûnerên federasyonê, baweriyênen xwe ji Palmlund re bi awaki fire izah kirin. Federasyon naxwaze ku informasyonê SIV dide der, bibin sedema ditinênen çewt di civata Swêd da, li hember kurdan.

Behsa rewşa kurdêni Kurdistana Iraqê ku tên Swêd, hat kirin. Her weha ji kurdêni Türkiye, ku ji Suriyê tên Swêd, ji hat şor kirin.

Piştî axaftina nûnerên federasyonê, Palmlund ji ditinênen xwe yên resmi diyar kir. Gelek deqen mişterek hatin ditin. Palmlund soz da ku ji vir şûn da SIV di beyanênen xwe da, dê bala xwe bide ku nebe sedemê hember kurdan.

AMERİKA HÊZÊN XWE LI KURDISTANÊ BI CÎH DIKE !

A. Tigris

AMERİKA YEKBÜYİ HÊZÊN XWE YÊN ÇALAK I ÈRİŞKAR LI KURDISTANÊ BI CÎH DIKE

Amerika Yekbûyi, dixwaze bi daxwaz û bi rôdana Tirkîyê, hêzên xwe yên çalak i èrişkar, li Kurdistana Tirkîyê bi cih bîke. Gelo hêzên "çalak i èrişkar"çı ne û çîma li Kurdistana Tirkîyê dixwazin bi cih bîkin?

Hêzên çalak i èrişkar ji aliyê A.Y. (Amerika Yekbûyi) avakîrin, hêzeki kevn e. Lî belê, sal bi sal ev hêzên han ji aliyê tekniki û hêçandin ve tê nûkîrin û têkûzkîrin. A.Y. berê van hêzên xwe yên mirovkuj û xwinrêj li Komara Dominikê, Kongoya Belçiqayê, Koreya Bakur û li Vietnamê bîkar anibû.

Lî gor diyariya rojnamevanê Rojava, van hêzên ku dixwazin iro li Kurdistanê bi cih bîkin, ji aliyê leşkeri ve weha ne:

1000leşkerên komando, 105 helikopterên erişkar, 500 fuzyeyen balefirân, 160 tanqswar, 64 topê hawan û heta ku tu bêji çekêن pêyade hene.

HÊZÊN ÇALAK I ÈRİŞKAR DI SEETAN DE,LI HER DERÊ DINÊ HAZIR Ü NAZIR IN.

Axaftvanê hêzên çalak i èrişkar serbaz Jake Dye, wîsa pesn û fortê hêzên xwe dike:

"Hêzên me, hêzeki hazır û nazir e. Dî nav 18 seetan de kare xwe bigihine her aliyê dine û rewşa atmosferi û cografi çi dibe bila bibe, em karin li wê heremê, dî gaveke kurt de bigehijine armanca xwe."

Belê geli xwendevanê hêja; Ev hêz, hêzeki wîlo ye, ku ji bo mirovkuji û xwinrêjiye, dixwazin li Kurdistanê bi cih bîkin. Sedem çi ne?

ARMANCA SEREKE Û BINGEHÎ YA PÊKANINA HÊZÊN ÇALAK I È- RİŞKAR, RAWESTINA TEKOŞINA GELÊ KURD E..

Wek di pratikê de ji tê diyarkirin û rasti ji ev e, ku ki çi dibêje bila bibêje, pêkanin û bi cih kirina vê hêza çavşor, xwinrêj üxwinmêj, rawestin û belavkirinna tekoşina gelê Kurd ya ji bo rizgarbûne ye. Belam, Armançen tali ji. Ji van armancan hin jê ev in, ku Kurdistan û Tirkîye ciranên Sovyet in. Lî Kurdistana Bakur hisyâbûna netewi di pêvajo û gehinekên giring û lez û bez de diji. Bêguman her çîqas iro hêzên siyasi yên Kurdistana Tirkîyê belav bin ji, ji bo ku di rîyeke çep da ne, dewleta Tirkîye û ya Amerika yekbûyi ji van hêzan pîr dîpelikun û ditursin. Ji xwe rewşa Tirkîye li ber çavan e. Tirkîye heta çokê, na; heta bin qırkê ketîye kriza abori, politik û ideolojik. Bir û baweriya Çina Karker, her roj di nav karkeran, gundiyan, xebatkar û ronakbirên Türk de belav dibe. İmperyalizma A.Y. ji Iran hate avêtin. Ev sê sal in, ku Kurdên Iranê li dij rejîma Melan şerê çekdari dîkin. Disan li İraqê textê Saddam dihêje û dilerize. Dî enîyeke de hevkariya hêzên pêşverûyên Ereb û Kurdan gewre dibe û pêşve dice.

Lî Rojhilata Navin Çavkani, serkani û biren petrolan di desten monopolen A.Y. dane. Lî gor statistikên navnete-

wi, di 0/0 60 hatîna petrola Rojhilata Navin derê A.Y. imperyalizma A.Y. bi darê zorê Rojhilata Navin kontrol dike. Lî vê heremê li dij imperyalizma A.Y. têkoşineke bê hempa heye. Rast û çepen politikavanê dewletên Rojhilata Navin diyar nine. Karê di şevekê de guhartinê giring pêk bêñ..

Lî, divê mirov ji bir ve neke, ku Tirkîye di rîexistina Nato de ye ji. İmperyalizma A.Y. ji van sedeman ji bo cih kirina hêzên çalak i èrişkar, ji Tirkîye çaktırin û baştîrin ne cih dibine, ne ji kirdayetiyeke wek cûnta faşist a Tirkîyê. A.Y. dest bi pêkanina vê proja han kî ji. Proja ji bo avakîrin û bi cihkirina hêzên çalak èrişkar gelek mezin û fireh e. Lî ku bê, tevayı ya Kurdistana Tirkîyê dide ber xwe. Niha balafirgeha bajarê Wanê (Van) fireh dîkin. Lî Mûşê, Mêrdinê (Mardin) û li bajarê Meletiyê (Malatya) ji, balafirgehîn leşkeri yên nû çedîkin. Lî bajarê Diyarbekirê radar û aletên leşkeri yên nû û modern bi cih dîkin û nokeren Nato hin ji bi hez dîkin.

Dî roja 29'ê Mîjdarê 1982' yan de ango, roja avakîrina Komara Tirkîyê, li Washingtonê, alikarê wezirê A.Y. yê şerê, Richard Perle, daxwuyaniyeki da rojnama "Hürriyet" û li ser vê mijarê van tiştan got:

"A.Y. ji bo modernkirina hêzên çekdar yên Türk bîyaren giring girt. Nato ji bo proja 160 balefirên çalak i èrişkar ji xwe fon vekirye."

Serokê rîexistina "CIA" ji çendeki berê seriyeke li Ankarê xistibû. Disan li gor şorevekirinan, ev mijara hêzên ca-

lak i êrişkar ji, di programa wi de hebû.


Dewleta Tirkîyê, li himber dewletên Ereban û yên Rojhilata Navin politikeki durû û rûviti dajo. Bi şeleke vekiri li himber dewletên Rojhilata Navin, bi taybeti li dij dewletên Ereban cih nagare. Jî lew re gengaziyêن (ihtiyaç) dewleta Türk, bi petrol û bazara wan heye. Jî van sedeman bî siyaseteke rûviti xwe xwe ber bî van dewletan dişine û sedemê vê nêzikbûnê ji, dinê islamê şan dide. Dewleta Türk, bî taybeticûnta Türk politika rojê çê dîke û dixwaze bî vê politikayê dewletên Ereban bixapîne. Destê xwe, ne ji dêrê, ne ji ji mîzgeftê dîke. Jî aliyê abori (ekonomik), politik, leşkeri, rîexistini û dageri (idari) ve hevsarê dewleta Türk di destê A.Y. da ye. Jî xwe deqa giring ji, ev e. Bi rasti iro, Turkiye bûye wek eyaleteke ji eyaleta A. Yekbûyi. A.Y., li Kurdistanê bî cih kırna hêzên xwe yên çalak i êrişkar, dixwaze Turkiye ji bî aweke aktif bikeve nav êrişên vegirtiğên (işgal) welatên Ereban. Cûnta faşist ji, ji xwe çavêن xwe berdaye vegirtina heremên petrolê.

DO KURDISTANÊ PARKIRIN IRO DIXWAZIN JI NAVÊ RAKIN

Ev ji aliyê her kesive diyar e, ku ji bo pêkanin û cih kırna hêzên çalak i êrişkar, bî rasti armancê A.Y. û cûnta

Tûrk pir ali ne. Lê armanca sereke; rawestin û belav kinna şerê rizgariya netewiya gelê Kurd e. İro li her çar perçen Kurdistanê ji, gelê Kurd, li dij imperializmê, kapitalizmê û kolonyalizmê şerê sar û yê germ ges dîke û gurr dîke. Azadbûna Kurdistanê, li Rojhilata Navin guhartineke heri mezin çêdi. Pişt li imperializmê û li kolonya-

lizmê dışkine. A.Y. û cûnta faşist, hemû hesabê projê û planên xwe yên hûr û kûr, li ser vê yekê dîkin. Hêzên çalak i êrişkar li gor van armancan û planan ava û bî cih dîkin. Di bingehê dozê de tiştên nû tunin. Do hêzên imperialist û kolonyalist, di nav xwe de Kurdistanê parkirin, iro ji, dixwazin ji navê rakin. Doz û armanca wan ev e...



İNSTITUY KURDİ LI FRANSAYE !

BI ALIKARIYA HUKUMETA MITTERAND, LI PARIS'Ê, İNSTITUYA KURDİ HAT DAMEZRANDIN

İlana jêrin bang alikariya İnstituyê dike û bi kurtebiri weha dibêje:

Çanda 20 milyon Kurd di xetera mirinê de ye. Dewletên ku Kurdistanê parvekirine dixwazin çanda netewa Kurd, bi awaki sistematik û ji bin ve hilweşinir. Senatkar, nûiskar, dirokvan û zmanzanên Kurd, ên ku cêli (sûrgün, exil) bûne ji bo ku rê li vê jenosida çandi bigrin instituyeye Kurdi damezrandine. Hebûna gelê Kurd di xeterê de ye û rêxistinê navnetewi (UNO, UNESCO û hwd.) li hember vê rewşê bêdeng mane. Gelê Kurd, piştevaniya gelên din divê.

S.O.S CULTURE EN PERIL!

10 décembre 1982

La culture millénaire des 20 millions de Kurdes du Proche-Orient est en péril de mort. Bannie, objet de destruction systématique de la part des Etats qui se partagent le pays Kurde, cette partie originale du patrimoine culturel universel risque de disparaître à tout jamais. Les artistes, écrivains, historiens et linguistes kurdes exilés en Europe, conscients du fait qu'un peuple privé de sa culture est condamné à mourir à petit feu, viennent de créer un Institut Kurde* pour résister à ce véritable génocide culturel. Face au silence et à l'inaction des organisations inter-étatiques (ONU, UNESCO, etc.), le peuple Kurde, menacé dans son existence, a besoin de la solidarité des autres peuples. De votre solidarité.



MEM Ü ZİN
CE chef d'œuvre de la littérature kurde du XVIII^e siècle est aujourd'hui interdit en Turquie. Comme toute autre publication, toute manifestation artistique en langue kurde.



DR. ISMAIL BESİKÇİ

Ce sociologue turc enseignant à la faculté des Sciences politiques d'Ankara, s'est vu depuis 1970, condamné à 25 ans de prison pour ses travaux universitaires sur les Kurdes. Prison, exil ou liquidation physique : tel est le sort que l'état turc réserve aux défenseurs de la culture kurde et même à ceux qui osent parler de l'existence des Kurdes en Turquie.

* Association Loris 1901

- Je souhaite participer à l'action de sauvetage de la culture kurde. J'envoie un chèque de ... F à l'ordre de l'Institut Kurde
- Je désire recevoir, en outre, une documentation écrite et le bulletin d'information de l'Institut Kurde.

Olikariya instituyê bike!
vêder isaret bike û bisne vê
adresse

INSTITUT KURDE DE PARIS
Boîte postale 66, 75662 PARIS Cedex 14
CCP 573895 E PARIS


DI WARÊ PARASTINA ZMÊN DE

Osman Sabri

*I*ro li pêş me her kurdeki xwenda, hişyar, bîrewer û gelparêz kireke bilind û hêja heye, ku ew jî parastina zaravayê kurdmancî ye. Kurdmancî ku yek ji zaravayên kundiye, li ser dirêjiya babelîskan (sedsal) bûye zimanekf xweser. Lê mixabin ku ev zara va nehatiye civandin û nivîsandin. Ji ber vê yekê gelekî bi şûnda maye. Iro vejandina wî hewceyî xebateke tevayî û xwesere. Ji bo pêşebirina vî zaravayê fireh û dewlemend xebata gelek kesen jîr, zana, serwext û bîbir divê. Herçî parastina ziman hemî kurdêñ xwenda jê berpirsiyarın. Diva xwendayêñ Kurd zimanê xwe ji nezaniya nezanan, çepeliya bîrnebiran, qurretiya xwedibînan biparêzin. Ev celeb kes, dikarin zimanê me yê delal û şîrîn bikin tîrşîk, wek rewşa me a siyasî yekcar bêmirêş bikin û berdin. Ma ne rewşa me a siyasî jî bî destêñ kesin holê bî şûnda ket û gelê Kurd ji azadiyê bêpar ma û heya iro heyîna me di nav destêñ biyanîyan da maye û dimîne.

Dil dixwaze ku xwendayêñ me nekevin vê şâşıya han û ji zimanê xwe ra qencîxwaz bimînin. Çawan yek ji wan çavêñ xwe ji toz û gemarê û her tiştê ku ji derva tê diparêze, divê zimanê xwe jî welê ji bêjeyêñ biyanî, ji bêjeyêñ pêkhatî ku şaş û çepel têne danîñ biparêze.

Di navbera pêncî salê ku bi ser bendewariya min bi ziman ra bo-



riye da gelek caran min dersen kurdmancî dane wan kesen ku xwestine hîmî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bibin. Di vî warî da ramanen ku min li ser van celeb kesan girtine gelekin. Ne mikûne ku wan ramanan li vir bi ser û ber, bi awakî berbiçav bini-visim. Nemaze piştî kal bûme, serê min herweki divê alîkariya min nake. Lê dikarim li ser vê yekê du-sê peyvan bêjim:

Ci kesen xwestine hîmî xwendin û nivîsandina zimanê bibin, piştî ku dest bi çêkirina hevokan kirine û bêjene nuh jî hîn bûne bawer dibin ku hîmî zimanê bûn û ne hewceyî westeke dîtirin û dev ji xwendina zimanê berdidin. Hinekên wan jî dema zimanê xwe didin ber zimanê fireh û pêşve çûyi, hînga di zimanê xwe da gelek kê maniyan dibînin. Dixwa-

zin wan kê maniyana bi hin bêjeyêñ çêkirî dagirin, tevî ku ne ji wan kesanin ku bikaribin bi karêkî holê rabin. Bê guman bêjeyêñ ku ew pêk gînin, wekî zanîna wan xav û bêkêrin. Dema jê dipirsî, te ev bêje ji kû anî ? dibêje: Min ji hinekan bihîst. Bê ku bikare cihê jê bihîstî ji te ra salixde. Ev celeb kes kambaxkeren zimanin. Bi aqîlê wan ku qencyîye bi zimanê xwe dikin, lê a rast ew zimêñ kambax dikin. Wek nezanê ku qelema xwe dirêji resmekê hêja ku hîn temam nebûye bike, tenê dikare wê resmê kirêt û bêmirêş bike.

Dikarim bêjim ku ziman wekî avahiyekê ye. Avahî dikare mezin bibe, biçûk bibe, xweşik bibe, kirêt bibe. Ev yeka han di destê kesen ku di destpêka nivîsandina zimanê da pê mijûl dibin da ye. Her bêjeyek kevirekî avahiya zimêne, iro ci kevirekî nebaş, an ne di cihê xwe da bête danîn, sibe nema tê te guhartin. Ji ber ku li ser wî kevirî avahî radi-be, bilind dibe nayê guhartin. Herkes ji me nizane bêjeyen nuh deyne, jê ra peyane serwext û xweser divêñ.

Di nava milletan da kesen jîr, zana û serwext pir dibin û hemîyên wan di avahiyen da rûdinin, lê herkes ji wan dikare avahiyekê bi destê xwe avake. Divê mihendis pîlana avahiyê deyne, peyayek keviran bibire û pêk bîne, hosta jî dîwaran rake. Kesek ji wan nikare bi karê yê din rabe. Na gava bixwaze pê rabe wê kambax bike berde.

Herçî hostane, hinekên wan dikarin ji gundiyan ra xaniyekî avakin u hinek jê dikarin qesrekî avakin. Ji bo her karekî ji van hin peya hene, kesek ji wan nikare bi karê yê din rabe. Gava her yek ji wan dest bavêje karê yê din xebat kirêt û bêmirêş dibe.

Ziman jî di destpêka hîmî wî da wekî avahiyê ye, divê destêñ nezan dirêjî hîm û bingehêñ wî nebin.

KURTENIVISAREK LI SER DIROKA ZIMANÊ KURDÎ YÊ NIVISANDÎ

Reşo Zilan

(Ji hejmara 4/1982 yan dom dike)

Ji ber vê yekê jî, wî dixwast ku ew bi çinînê, bi cot û cobar bi heywanxwedîkiri-nê ve mijûl bibin. War û warge-hêñ xwe şen û ava bikin. Di gel vê jî, Zerdeşt dixwast ku Kurd dev ji baweriyêñ xwe yêñ kevn û ne rast, yêñ wek rojperestî, dar-perestî û perestiya pûten ji mis yêñ têvel, berdin. Lê Kurd ji yêñ xwe nehatin xwarê û her ku çûn şerê xwe yê li hember Zerdeşt xurtir kirin û xwastin ku wî ji welatê xwe biqewirînin. Di dawiyê de, Zerdeşt nema dikar li ber xwe bide û bêgav ma ku ji nav Kurdan baz bide.

Heçî Zerdeşt e, herwekî ew di vê strana xwe de jî dibêje, dile wî ji vê bazdanê û derbederiye re pir ê şiyaye.

» Berê xwe bidim kijan welati, berê xwe bidim kû û bi kû de/ herim ?
Ez ê ji mala xwe, ji êl û eşîra / xwe vejetim.

Komên mirovan xwe nadîn aliye/min...
Bi ser de jî heremên ne baş yêñ/xelkê.
Ez çawan ji te Ahûramazdayî re,

da ku tu jê têr bawer bi, išpat/
bikim? »

Zerdeştê cîhiştî yê derbeder ji Mediyayê, ji welatê Kurdan, baz da û çû ba Farisan. Karbîdestêñ Farisan ew hewandin û jê re ðî derketin. Wek xuya ye, sebebêñ hewandina Zerdeşt ne bi te-nê yêñ olî (dînî) ne. Lê belê sebebêñ siyasi sebebêñ sereke ne. Zerdeşt û ola wî ji bo domandina karbîdestî û saltanata piraniya karbîdestêñ ïranê keys û firsendeke mezin bû. Wan jî ol wek karbîdestêñ din yêñ Tirk, Osmani, Ereb, Fars û hwd. Ji bo perçi-qandina ref û sinifêñ karker û hemû rivdêñ kedkar bi kar anîn...

Heçî pirtûka Avestayê ye, ji pênc pişkan - pirtûkovan - pêk tê t. Ew jî ev in:

- 1- Yasna
- 2- Vîspered
- 3- Vendîdad
- 4- Yaştan
- 5- Avesta piçûk

Di pişka yekemîn ya Avestayê de çend stranêñ olî hene, ku ji wan re Gata têñ gotin. Lê weki din, her pişkeke Avestayê der-heqa dêlindêz û qanûnêñ curbe-

"Delê: Jale(1) Bo wa talît ?

Delê: Le ber biramirdin.

Gulit bo wa cuwan e ?

Delê: Le ber dost û dujmin."
(ji gotinêñ bav û kalan)

cur yêñ olî de ne. Wek: Vendîdad qanûnêñ li dijî dê wan bi rêz dike û Yaştan jî ji stranêñ goribûnê pêk tê t û hwd.

Ev pişkêñ han yêñ Avestayê hemû di carekê de nehatine nivîsandin. Ew di çend salan de hatîne temam kirin. Li gor salixêñ dîrokzanan, pişkeke mezin yê Gatan ji aliye Zerdeşt bi xwe ve hatîye gotin û hûnandin. Lê piraniya nivîsareñ pirtûka Avestayê di dema İskenderê mezin yê Mekedonyayê de, ku gava wî Rojhelat xistibû bin destêñ xwe, winda bûne. Ji lew re, pirtûka Avestayê ya ku em tro pê dizanin, ne ya xwerû ye. Lê ya berhevkirî ye. Di nav padişahêñ ïranê de, yekemîn car Erdeşêrê papekan yê Sasanî (7) (224-241), dest avê te dabaşa kom û berhevkirina Avestayê. If paytexî xwe, fermanek derxist, da ku bir û pişkêñ vê ola tarûmarbûyî di bin serektiya Tansar de bêñ berhev kirin. Lê karê hevkirinê di dema şapûrê yekemîn (241-272) de jî domand. Di destpêka Avesta berhevkirî de çend rêz û hevokêñ pir helez he-ne. Yêñ ku Avesta kom kirine û bermayıyêñ wê ji tofana helenîz-

mê rizgar kirine, ji şahê xwe re weha nivîsandine:

"İskender pirtûkên ola me yên kevn, ku li ser 12 000 çermên gayan hatibûn nivîsandin; şewitan-din. Gelek destan, tore, qanûn û qayideyên me bi temamî hatin winda kirin..." (8)

Cara pê şin, komkirina hemû met-nen Avestayê, ano Avesta ku em iro pê dizanin, li dor sala 900- î qediya. Bi dû re ew wergerandin zimanê pehlewî û bi zimanê pehlewî ji şilo vekirin. Iro ji vê Avestayê re Zend-Avesta tê te gotin. Lê divê em bêjin, ku pir kesan bi awakî hîç ne rast û ne ji zanistî li Zend-Avestayê mîze kirine. Di mana peyva Zend-Avesta de ketine şasî û çewtiyêن pir mezin. Di vî warî de hinekan gotiye, ku "Avesta bi zimanê zendî" û hinekan ji gotiye, ku "ew ji pirtûkan, ji Zend û Avesta pêk têt". Lê ev herdu ditin û jihevderxistin ji çewt in. Ji zanistiyê dûr in. Lê belê, a rastî ew e, ku mana Zend-Avesta "Avesta ku hatiye şilo vekirin" e. Ji ber ku di zimanê pehlewî de mana peyva "Zend"-şilo-vekirin- e.

Di Avestayê de, ya ku di dema Sasaniyan de hatiye berhev kirin, bi qasî 345. 700 pevv hene. Lê di Zend-Avestayê de bi qasî 2.094. 200 pevv hene. Li hember vê, di Încîla bi zimanê Swêdî de bi qasî 700.000 pevv hene. (9)

Herçendî Zerdeş li erdê Medîyan ji dayîk bûye û bi zimanê xelkê vî erdî axaftiye û herçendî "di destpêkê de Med karbidest û Faris ji bindestê wan bûn" (10) lê di dest de hîç belgeyek tune, ku pirtûka Avesta ya xwerû, bi zimanê Mediyêñ wê sedsañ hatiye nivîsandin. Lê belê, wek me li jorê ji nişan da, girêdanêñ zimanê avestayî û kurdi tiştekî li ber çavan e û nayê ïnkar kirin. Di gel hindê ji heke em zimanê medî kurdiya kevn û zimanê kurdi yê iro ji kurdiya nû bihesibîn, mirov nikare bêje ku zimanê avesta-ñ kurdiya navîn e. (11)

Mamoste Merdûxî di pirtûka xwe de li ser zimanê kurdi digi-hêje wê qinyatê û dibêje, ku "piraniya dîrokzanan di vî warî de hemfikr in ku zimanê Medîyan her zinamê Kurden Mukriyan e. Herweha Zend-Avesta, ku bi zimanê medî hatiye nivîsandin, pir nezîkî zîmane mukri ye yan ji zimanê mukri bi xwe ye". Herweha dibêje, ku "zimanê Avesta Zerdeş zimanê kurdi ye medî ye". (12)

Bi a me, ev hin îdiayêñ bê bin-geh in û ji alîyê zanistî de ne rast-bin û objektif in. Ji ber ku berî her tiştî mamoste Merdûxî bi xwe ji di vî warî de tu belgeke berbiçav nadî, ku zimanê avesta zimanê medi ye. Wek ew bi xwe ji dibêje, heta niha tu belge û bermayıyêñ zimanê medi bi dest neketine, da ku merov wan bi zimanê awesta ve bide ber hev.

Hem zimanê Avesta Zerdeş ji ne zimanê avestayî yê rastin e. Wek me li jorê ji jê kad kir, Avesta di wextê xwe de nehatibû nivîsandin. Ew bi temamî bi devkî bû û wele di nav Îraniyan de belav dibû. Herwisan, heta iro ji hîç dîrokzanekî bi awakî zanistî û bi belge ew yek îspat nekiriye, ku zimanê pirtûka Avesta yê medî ye. Lê piraniya dîrokzanan qîma xwe bi texmînan tînin û dibêjin "heye ku zimanê Avesta zimanê ïranî ya roj-avayî be". Heçî zimanê pirtûka Zend-Avesta ye, disan wek me li jorê ji bi dûr û dirêjahî jê kad kîribû, ne zimanê Medîyan e. Li bervajiyê ve, zimanê pehlewî ye. Di vê yekê de hîç guman tune û bi ser de ji ev yeka ha bi awaki zanistî û misogerî hatiye îspat kirin. Heke dirûvîn zimanê medî (yan ji kurdiya iro) têde hebin, ev nabe bingehêke rastîn, ku em jê re bêjin ew bi zimanê medî ye. Çawan ku iro ji dirûvîn zimanê farisî di zimanê kurdi de hene wi san ji dirûvîn zimanê kurdi di zimanê farisî de hene. Ev bi tenê pismamtiya zimanêñ kurdi û fari-sî nîşan dide, ne ku tiştekî din. Lê belê, wek mamoste Merdûxî ji

dibêje, rast e, ku devokê Mukriyan nê zîkî zimanê medî ye û he-ta ew bi xwe ye.

Em bi van rêzêñ jorîn ve nax-wazin bêjin û bînin zimêñ, ku Kurd û nemaze bavikêñ wan yên wek Medîyan, ne xwedî ziman û bajarvaniyê bûn. Li bervajiyê vê, ew bê guman xwedî ziman û ba-jarvaniyekê bûn. Hem ji zimanekî zelal û bajarvaniyeke bilind. Lê boblat û tofanêñ dîrokî rê nedan ku ew bibîşkîvin û gul vedin. Ew hîn di dema ciwaniyê de hatin çîlmisandin. Ji lew re ji em niha ji bermayı û hêjayiyêñ wan bê-par in. Nikarin bibin hevparêñ dahat, berhem û afirandinêñ wan.

Dûmahîk heye

6- Oldenberg, Herman, Her disan di afirandina jorîn ya hejmar 3 an de. Rûpel 91

7- Heçî Erdeşêr (Artexşetra) e, kurê papek û ji malbata Sasaniyan e. Lê, nemaze hin Kurd wî ji Kurdan dihesibînîn. Me dil nine, ku em li ser vê pirsê di vê benda xwe de rabiwestin. Bê guman di-vê mirov li vê pirse bikole û wê rohani bike... Ji bo agehi li van pirtûkan binhîrin:

Cegerxwin, Ferhenga Kurdi, mar 1, rûpel 35-36, Bexbad 1962
Giw Mukriyanî, Ferhengî Mehabad, çapî yekemîn, Lapere C, Hewlîr 1961

C.P.B., Dîroka Kurdistan, bi kurtebirî, Berg 1, Rûpel 111, (Beyrût ?)

8-Söderblom, Nathan, Om Religionsurkunder, S. 125, Malmö 1954

9-Söderblom, Nathan, Her disan di afirandina jorîn ya hejmar 6 an de. Rûpel 127

10-Grimberg, Carl, Världshistoria, Folkens Liv och Kultur, forntiden 11, S. 12, Stockholm 1976

11-Nebez, Jemal, Zimanî yekgirtûy Kurdi, Zencîrey Kurdewanî I, Lapere 10, Amberg 1976

12- Mardoxî Kordestânî, Şeyx Mohammad; Târixî Mardox, Târixî Kord o Kordestân, cild 1, S. 41, çapî diwom, Téhran (1951?)

ZARAVÊN ME Ü ZIMANÊ NIVISANDI

Malmisanij

Yek ji navginê (wesite) bingehin ên ku mirov ji bo meşandina xebatê, li hevdu kîrinê, hevdu têghiştinê û hevdu gîhandinê bî kar tinin, ziman e. Ziman, dî dû boriyeki diroki yê bî hezar salan re, dî derbasbûna heywantiyê bî bal mirovitiye de wek hêmaneke bingehin derket nav cîvata mirovan. Ketnav cîvata mirovan, dî nav wan de têkûzbû û belav bû. Rojêñ wulo hatin ku cîvatêñ ku bî yek zimanek dîpeyivin, ji ber gelek sedemên abori mêtüyî û xwezayî (tebii) ji hev belavbûn, bî hev cih guhastin an ji rasti cîvatêñ din hatin û tevi wan bûn. Vê pêvajoyê weha dom kîr û ziman ji bi teşeyen (biçim) têvel jiyana xwe ajot. Lî, bî guherin, bî pêşveçûn û bî kelândina bî elementêñ (unsur) biyani ve.

Cîvatêñ ku zimanêñ Hind - Ewrûpi dîpeyivin ji - ku zimanê kurdi ji yek ji wan e - dî nav vê pêvajoyê de jin. İro, ji elementêñ müşterek ên zimanêñ Hind - Ewrûpi tê fêm kîrin ku dî rabîrdüyeki dur de danûstendinê bapirêñ van cîvatan bî hevdu re hebûne. Ev cîvat, dî nav zeman de ji hevdu veqtiyane. Dî gelek riyan diroki de derbas bûne û heta iro hatine. Bingehêñ zimanêñ Hind - Ewrûpiyê Asyayê xwe disperin zimanê Avesta, Farisiya Kevn û Sanskriti.

Bapirêñ Kurdan dî Asyayê de li Kurdistanê bî cih bûn. Herçend rehîn zimanê wan xwe digihinûn Avesta ji dî netica danustendinê bî elementêñ biyani re zimanê wan guherinê mezîn derbas kîr.

Kurdistan, ji aliyê cografi ve ji êrişen êlén (qewm) biyani re vekiri ye. Bapirêñ Kurdan, ji ber ku heta ciheki wek Mezopotamya - ku ji aliyen abori û mêtüyî ve zaf gîring e - belavbubûn, mecbûr man ku tim û tim bî cîvatêñ biyani (Moxol, Tirk, Ereb, Ecem, Bizans û hwd.) mijûl bibin. Ji ber vê mijûlayiyê, avayıya wan ji gelek caran hejiya. Ji bin ve winda nebûn lê dî vê navê de belavbûn, ji hev veqtiyan û li ser çiyyayê xwe pîre caran wek girtiyani lê bî isyankari jin. Zimanê kurdi bû çend beş. Sedemên jihevcîhêbûna zimanan yêñ ku pêsi têñ hisê mirov ev in :

- 1- Qada (saha) hilberinê : yêñ ku bî çandini û heywanan mijûl dibin, koçer...
- 2- Qada ciwarbûnê : bajari û gundi.
- 3- Qada cografi : deşt, çiya, qerexên çeman, tesira iklimê.
- 4- Peywendiyen bî cîvatêñ din re : mesela yen ku nêzi Ereb û Tîrkan ìn û danûstendinê wan ên ji nêz ve hene.
- 5- Elementêñ dini : mesela Kurdêñ ku bî Misilmaniyê bawer kîrine û yêñ ku bî Eziditîyê bawer kîrine.
- 6- Nêzbûn û dûrbûna ji merkezêñ ba-zîrganî re.
- 7- Dûrbûn û nêzbûna ji saha tesira dewletê.
- 8- Şer û malbarkîn.

Ev guherinê hezarsalan ketin ser hev û zaravêñ kurdi pêk hatin. Her yek ji van zaravayêñ ji xwediyê çend devokan e.

Dî demeke direj de, bêparmayina ji dewleteke merkezi û ji temerkuzeke cîvak - abori (sosyo - ekonomik) ku

zimanê nivisandinê bî pêş ve dibe têveliyen dî ziman de zêde kîr. Mirovêñ me hatin rewşêke wulo ku carîna nikarîn hevdu têbighîn. Dî bingehi de, dî zimanêñ din de ji, ji ber sedemên ku em li ser diaxêfin zarava hene.

Dî heymana (çax) me de ji, vê carê zimanê kurdi yan bî barbariya zagonêñ mêtîngîhkar (qanûnen kolonyalist) hat kilit kîrin yan ji alfabetê têvel, wek Erebi, Krili û Latini bî kar anî. Lew re, yan ziman neket nivisandinê, yan ji, ji ber alfabetê têvel Kurdan nikaribûn nivisarêñ hevdu bixwinin. Ji ber bêparmayina ji zimanê nivisandinê, ku karîbin carîna nivisarêñ hevdu bixwinin ji tênağıhîjin.

Lê digel vê yekê ji, Kurden ku bî sedsalan li ber xwe dane, iro, digel hemû dijwariyan zimanê xwe yê nivisandinê pêk anîne û pêş de dibin. İro, idi zaravêñ me yêñ wek Sorani ku xwediye gelek materyalêñ nivisandi ne, hene. Yan ji, li dinê, li deveren cihe - cihe kovar û rojnamen me yêñ ku bî rengeki periyodik têñ weşandin, hene. Tîşteki ku hin bêtir dilen me xweş dike : Kovaren me yêñ ku bî tipen Latinî û bî çend zaravayan têñ weşandin hene. Digel van pêşveçûnen ku me dilşad dîkin mixabin em rasti hînek kesen wulo ji têñ ku pêşveçûna ziman a diroki, pêkhatîna zaravan, gîringiya zimanê nivisandi û gîringiya zimanê nivisandi yê iroyin ji bo zimanê pêşerojê, tê negîhiştine. Hînek kesen weha, têkoşîna ku ji bo zimanê nivisandinê tê kîrin piçük dibinin û mesela dihêlin "pişti

şoreşê". Hinek ji dî riya makro - politikayê de zîman û xebatên çandi, bi gotina "çirok - mirok..." sıvık dikin. A heri giring, hinekkesen din ji, belki bi "niyeta qenc" ji bo "yekitiya zîman" dixwazin tenê bî zaravaki bêt nivisandin. Lew_re. li gor wan, nivisandina bi zaravên din ne pewist e. Lê divê neyêt jibirkirin ku metodê zanisti wek warê din dî warê zîman de ji, dibêje bi rengeki objektif rastiyê ji xwe re bikin bingeh û teşxisa xwe li gor wê bikin. Tenê piştî têgîştina rewşa heyi çare tê ditin. Li Kurdistanâ iroyin zaravên ji hev cuda têşor kîrîn Jî bo ku fikire-kê bide xwendevan em xeriteke zîman ji raber dikin (I). Divê em diyar bikin, ku hewcedariyeke mezîn bî xeritên zîman ên ku cryen zaravan bî fireyi raber dikin, heye. Wek ku tê zanin, pîra-niya mîletê Kurd zarava Kurmanci (Kurmanciya Bakur), yêni mayi Sorani (Kurmanciya Başûr), Zazaki (Kîrdki, Dîmîli), Hewremani - Gorani, Kîrmanşai, Lurri - Feyli dipeyîvin. Jî van, di Sorani û Kurmanci de zîmanê nivisandi li gor yêni din pêş ve çûye, dî zaravên din de zîmanê nivisandi û xebatên tîngistik zaf kêm in û em dî nîvî duwemê sedsala bistan de ne! Pir kêm bin ji, li ser van zaravan hinek xebat hatine kîrîn. (Em ji van, ên gring bî rengeki bibliografik li jîr dinîvisinin) (II). A gring, bî qandî karina me nivisandina van zaravan û lekolinen | linguistik in. An na, heke em bejin "ji xwe ev..... ji me kêm bû" û bi vi awayi ji xwe re ambargo binin û çav û guhêñ xwe bigrin, em nikarin pîrsen zîmanê xwe çareser bikin. Armancê bingehin û nihai, helbet gihiştina yekitiya zîmanê netewi ye. Lê ev kareki ku bî lez bêt kîrîn nine, ne karê rojan û salan e. Yekitiya zîmaneki carina pêvajoyeke gelek dîrej dide ber xwe. Di nav vê pêvajoya gelek dîrej de, divê pêsi zaravên ku hene bîn nivisandin, ferhengen wan û strukturên wan ên rîzimani bî awaki zanisti derkevin rastê. Li aliyê din, divê em van zaravan ji aliyê fonetik (zanyariya dengan), morfolojik, sentaks (avyaya hevokan - cimle -) û semantik (zanyariya têgihanê - mana -) ve dûr û dîrej bîdin ber hev (mîçayese bikin). Bi zanina xezina bêjeyen zaravan, strukturê wan ên rîzimani û bî zanina minayı û cudatiyên di nav wan de em dikarin bigihîjin xebatên ber bî yekitiya zîman ve. Ev, ji bo bî kûrayi û fireyi têgîhiş-

tuna zîmanê kurdi û diroka edebiyata kurdi ji pêwest e.


Divê ji aliyê pratik - pragmatik ve ji hemû zarava bîn nivisandin û analizkirin. An na, bêi zanina zaravên wan em ê çawa bîkarîbin xitabi bî milyonan mîrov bikin ? Em ê çawa bîkarîbin wan bîkşinîn qada tekoşinê ? Zîmanê nivisandinê ji vi aliyi ve ji gelek hîsayîyan bî ber me dixe. Di zîhniyet û toreyâ (tradisyon) eşiri de, her eşiret an grubeke Kurd, yêni derveyi xwe piçûk û nîzm dîbîne. Bêi terikandina vê zîhniyetê em dikarin toreyen rast û bî sihhet pêk binin ?

Têkoşina ji bo zîman, parçeki bî tesir ê tekoşina cîvaki ya domdar û pîraliye. Di her zarava û devokên kurdi de materyalîn bî devki yêni zor dewlemend hene. Vatîniya me, bijartın û nivisandina wan e. Çawa ku dî her çandeke netewi de qîmeten ku dîbin malê çanda dinê hene ; wulo ji dî her zarava û devoki de materyalîn ku zîmanê kurdi dewlemend bikin hene. Bes em bizanîbin wan bîdin hev, bîcîvinin, bîbijîren û derbasi nivisandinê bikin. Qet ne be, em nekevin pêsiya kesen ku bî vê yekê dadikevin.

Tenê bî kîrîna van tiştan em dikarin

ji yekitiya zîman re xîzmet bikin. Di xîzmeta yekitiya zîmande ev şertêne pêşin in. Piştî rohnikirina dewlemendi û hîmanîn (xususiyet) her zarava û devoki, xebatên zîman dikarin bê li-kîmandin bîmeşin. Dr. Celile Celil, di vê xususê de weha dîbêje : "Serê seri da divê ku her zarava bî kûrayi û fireyi ji aliyen zanayen wan zarava de bîne ronak kîrîn. Hemû dewlemendiya xebber (ûse) ên zaravan bî ferhengi bê dîyinê, bînyata rîzimanê bê nas kîrîn, bê bîlav kîrîn li hemû aliyan, ji xwendevanen Kurdan re.... Gava em hemû xebberen zaravan bizanîbin çêkirina termina kulek nabin'. Yekitiya zîman bî ditina min gîredaiya mesela politik e û çêkirina mical (hez) ed politik in. Gava her alîye Kurdistanê bigihijine hev, di wê demê da ji disa ev pîrs bî zorê ne gerek e. Bona vê ji disa demeki dîrej û tebi'i divê..."

Di kurdi de raçandina bêjeyan (çekirina kelimên nû) ji pîrseke aktuel e. Hinek kes, ji bo bêjeyen ku dî kurdi de tunene an di hinek zarava û devokan de hene, lê ew nîzanîn, ji ber xwe ve bêjeyan radicinîn. Bî vi awayi di şûna yek bêjekê de gelek bêjeyen raçandi derdikevin piyasê. Eger em li ser vê xususê têr neponijin, di zîman de wê nexweşinêne giran peyda bîbin. Rehet-



Zaravayen ku li Kurdistanê têr peyivandin

kırına van nexweşinan ji ne hësa ye. Lew re, raçandına bêjeyan berpirsiyariyekê giran e. Pêwîstîya nîvisandina bî zaravên têvel ji gelek aliyan ve eşkere ye. Lê dî vê xususê de çewtîyeke dîn ji mewzû - bahs e. Dîvê ev çewti ji neyêt kîrin. Her zarava, di şûna ku bî serê xwe bêjeyen nû raçine, dîvê bêjeyen literatürel ên zaravên dîn bî kar bine.

An na, zaravên me, her ku diçe wê ji hev dûr bîkevin û ev ji rê li pêşveçûneke neyini (menfi) vedike. Ji kijan zaravayı dibe, bîla bîbe, hilberiyê produktê folklori yên ku têñ berhev kîrin, dîvê wek orijinalên xwe bîn nîvisandin. Tewer (hetta) dîvê ew kes û heremîn ku ev hilberi ji wan hatine stêndin ji bîn şanidan. Heke em bî liberçavgir-

tina van deqan (nuqte) hemû zaravên zîmanê xwe yê ku xwedîyê gelek dewlemendîyan e, derbasi nîvisandinê bîkin, wê zîmanê pêş ve bîce. Cudatiyêng ên heremi (lokali) pêsi wê dî nav her zaravayı bî xwe dê rabîn û dî dû re wê zaravên me nêzi hevdû bibin. Heke ne wulo be, bî baweriya me wê ev cudiati her ku diçe zêdetir bibin.

(I) Bruinessen, M.M van - Agha, Shaikh and state (on the social and political organization of Kurdistan), 1978 : 30
 (II) 1- Benedictsen, A.M - Christensen, A. - Les Dialectes d'Auroman et Pâwâ, Kobenhavn, 1921

2- Dersimi, M.N. - Kürdistan Tarihinde Dersim, Halep, 1952, 42 - 56

3- Devrimci Demokrat Gençlik (Dergisi) - Dil Konusunda Bir Araşturma, İstanbul, 1978, Nr : 1 - 11

4- Fuad, Kemal - Kurdische Handschriften (werz.d.orient. Handschr. in Deutschland XXX), Wiesbaden, 1970.

5- Hadank, Karl - Mann, Oskar - Mundarten der Guran, besonders das kandulai, Auramani und Badschalani, Berlin, 1930.

6- Hadank, Karl - Mann, Oskar - Mundarten der Zazî, hauptsächlich aus Siwerek und Kor., Berlin, 1932.

7- Hewrami, Seydi - Diwan (bî zarava Hewrami).

8- Jaba, A. - Dictionnaire Kurde - Français, St Petersbourg, 1879.

9- Kurdo, Qanatê - "Kategoriya cinsan, navan û konstruksiya berkari li Zaza da."

10- Kurdo, Qanatê - "Sazmaniya berkari (konstruksiya obëkti) li Zaza de." têzisên gotaran bo qedrê heftê saliya V.I. Abdêv (bî Rusi : K.K. Kurdo-êv, Obakinaya Konstruksiya li Zaza da.)

11- Lerch, P. - Issledovanie Ob iransk Kurdax i ix predkax severníx xaldej, Spu. 1856 - 1857, 1858.

12- Mac Kenzie, D.N. - "Guran" (Enzyklopädie des Islam)

13 Mac Kenzie, D. N. The Dialect of Auroman (Hewraman-i Luhon), Kobenhavn, 1966.

14- Mac Kenzie, D.N - The origins of Kurdish, Transactions of the philological society, 1961 : 68 - 86.

15- Mewlewi (Abdurrahim

Tewgozi), Diwan (bî zarava Hewrami).

16- Minorsky, V. - "The Gûran" (Bulletin of the school of oriental and African studies, 1943, XI/1 : 75 - 103).

17- Minorsky, V. - Enzyklopädie des Islam ("Kurd", "Kurdistan", "Lek", "Lur", "Luristan", "senna").

18- Mukriyani, Giw, - Elf û Bêy Kurdi wênedar be tipi Latini be zara-wekani Sorani, Badini, Feyli, Hewramani, Hewlîr, 1972.

19- Mukri, M. - Text in Archaic Gûran Dialects.

20- Soane, E. B. - "A short anthology of Gurani Poetry", journal of The Royal Asiatic Society, 1921 : 57 - 81.

21- Tahir, Baba - (Helbestêñ Lurri)

22- Wahby, Taufiq - The origins of the Kurds and their language, Sweden - 1982.

JI ZMANÊ ÇARINAN

KULMEK EVİN II

M.Ferzend Baran

X


Evin, xezala birindar
Maxrûr û westiyayi
Xwe li kepîran dixe
Bo dilopa ava jîyanê

XI

Tu,
Ava pola
Axa sosma
Û heviya çavêñ mirovêñ me, tu...

XII

Tu, dî navbera xwesiyyêñ rûpelêñ
- Qedim de
Tu, li ser çavêñ teyra zerdeş
Tu, dî nav çıriska agrî yê Ararat
Tu, bî binevştêñ çiyayê Suphanê ve



- VII


Evindarê, evindarê
Kor, ker, lal ne be
Evindarê, evindarê
Dijmin disa ew dijmin yê n sedsalan in.

VIII

Evindarê,
Eger rojek westiyam û ketim
Eger rojek ax'a delal bang min ki
- Bo govenda dawi
Birneke... min ji bigre ba xwe

IX

Ez çawa bikim ?
Kûrê xelkeki birindar
Sorgula evinek pelixi me
Ez çawa bikim ?



NAMÊN XWENDEVANAN

JI BERPIRSIYARÊN KOVARA BERBANGÊ RE.

Beri destpê ka name ya xwe, ez silavêن birati li welatperwer, şo-reshger û rizgarixwazan dîkim, yêñ ku ji bo serbixwebûna wela-tê xwe û azadiya gelê xwe tê di-koşin.

Kovara federasyonê komelêñ Kurdistânê li Swêd "Berbang" kete destê min. Bî rasti kovarekê geleki hêja û giranbiha ye. Bi-xweser nivisandina wê ya zimanê Kurdi, giranbiha û delali ya wê bêtir dike û mirov bêtir baldari xwe dike.

Serbîlindi û dîlxweşıya mezin eve, ku komelêñ Kurdan tev xwe gihandine hev û li bin ala fede-rasyonekê de gihane hev. Ez ba-werim ku ev daxwaza hemû kur-dan û welatperweran e.

Lê daxwaza heri mezin eve ku şo-reshger, pêşverû, welatperwer û sosyalistên kurdan li bin alekê saziyekê de bibin yek, li ser rê-çeve rast, bê berjевendi (menfe-et) û bê sinçi ti doza xwe berbi pêş bibin. Ger ne usa be, ger em tev desten xwe nedîn hev û piş-tîn xwe ji hevra nekin hêt (di-war) rizgari û xelasiya me kurdan tişteki pir dijware. Jî ber vêna ye ku gelê me bî sed salan şerê ser-bixwebûn û azadiyê daye, lê hêji ne gihaye daxwaz û kama dîlêñ xwe.

Bî kurti, dem dema pişt girtin, dem dema destgirtin, dem dema yekiti û hevalbendi yê ye.

Berbang, bî zimaneki pir xweş hatiye nivisandin. Daxwaza min eve, ku Berbang jiyana xwe bî zi-manê xwe yê zikmaki berdewam bîke û bî kurdî bîdomine. Çaxa wîsa be, ez bawerim ku, wê gelek bêrdari (feyde) li kurdan bîbe û herweha wê zimanê wan berbi-pêş ve here.

Lê belê di Berbangê de şashi û çewtiyekî pir mezin hatiye kîrin. Ger ev şashi bî zaneti hatibe û bê kîrin bî ya min ev pişavtin û dax-waza dijmin tine cih.

Ev şashi eve :

Dî rastnîvis û gramerâ Kurdi de divê tip. (herf) ên Kurdi bî rastin bê nivisandin. Divê zimanê me li ser hebûna xwe bê nivisandin, ne bî tip ên welatin din.

Wek "i" û "î" (Dî Kurdi de bî kumik û bê kumik e)

Dî Kurdi de ev tip hene. Û tu kes nikare vêna li gor zanina xwe bipşeve. Mafê tu kesi tune ye ku bî zimanê Kurdi bilize û ji serê xwe tiştan derxine. Divê dî Kurdi de rastin "i" "î" bê nivisandim û bikaranin. Tipêñ "i" "î" bî Turki ne û ji bo zimanê me û karnayê. Mafê tu kesi ji tune ye ku daxwaza dijmin bine cih û zi-manê me û tipêñ wê bipşeve.

Ev yek ji daxwazêñ dijmine ku zimanê me biguherine û bêjeya xwe têxe nav bêje û zimanê Kurdi. Em vêna xweş dibinim ku, gelek ji kurdan nemaze yêñ dor-hêla (Konya, Meletya, û.h.w.d.) hatine asimile (pişavtin) kîrin û çaxa diaxîvin ji sedi heşte goti-nêñ turki dixin nav zimanê Kur-di. Vêna em tev dizanîn û dibî-nin. Ev ji, ji ber, ku bî zimanê xwe ne xwendine û ne nivisandine. Lê ev kês li Awrûpa heye. Di-vê bî pirtük, kovar û rojnameyêñ Kurdi, Kurdiyeke xweser bê nivisandin, daku ev birayêñ meni, ku hatine pişavtin, ji vê çirav û ji nav vê heri yê derkevin û bikar-bîn bî zimanê xwe biaxîvin. Ger ne wîsa be derketina ji nav çirava dijmin ne hêsanî ye.

We di Berbangê de gotiye ku, ji bo hêsanîye me "i" "î" nivisandine. Bî a min ev ne hêsanî, ev ji bo kurdan û ji bo bêje ya kurdan şemaqke mezine. Ger hûn dîxwazin bî zimanê Kurdi binivisin, û bêje ya Kurdi bipşeve bibin, divê hûn bî rastin û bî bin-

geha bêje ya Kurdi binivisin. Ne ku bêje ya Kurdi bipşêvin û tipêñ biyani têxin şûna tipêñ Kurdi. Bî a min hûn bîşk (isti-mar) bî bêje û tipêñ Kurdi dîkim. Ger hûn wiha berdewam bîkin, hûnê birinekê mezin di bêje ya Kurdi de ve bîkin. Û birindar bîkin. Herweha hûnê bibin aşta ku Kurd hîni Kurdî ya şashi bibin.

Dî vê dema me de gelek rabûne û cûre cûre pirtük an gramerê Kurdi ji serê xwe derxistîne û li gor xwe bî kar anine. Her kes ji serê xwe rézîmaneke Kurdi der-dixe. Ez bî xwe ji dikarım ji serê xwe hînek tiştan binivisim, lê ev tişteki şâse. Jî ber ku, bingeha rézîman û gramerâ Kurdi "Mir Celadet Bedrîxan" derxistîye. Bî a min ew ji hemûyan rastire. Jî ber ku, bingeh bî desten wi hati-ye avê tin, û ev çend salin zimanê Kurdi dî rêça wi de tê nivisan-din.

Bî kurti, divê Kurdi rastin bê nivisandin, divê bîşk bî tip û bêje ya me berbipêş ve here û dew-le-mend bîbe, ger bî şashi bê nivisandin, wê Kurd bî şashi hîni xwendim û nivisandinê bibin û herweha, wê bêje ya wan bipşê ve û jar bîbe.

Daxwaza min eve ku hûn Kur-di yeke xweser û rastin binivisin, ne ku, pê bilizin.

Ez cardin Berbangê piroz dî-kim û silavêñ xwe ji wera bî rê dîkim. Hêvidarım ku Berbang biji û bidome.

Tê bîni:

Ger hûn vê nivisara min di Ber-bangê de biweşinin ezê dîlxweş bibim.

Brayê we
Brindar

Jİ NIVİSVANÊN BERBANGÊ RE

Du hejmarêñ kovara we a Kurd-û welatparêz hatin gihan destê min. Bi

NAMÊN XWENDEVANAN

rastî ji bona me Kurdên ku dixwazin li derî welat hin xebatê çandî û wêjeyî (edebî) bikin ; kovara BERBANG zehf rind e.

Pirozkirina we welat - û Kurdparêzan pêwist e. Merov bi Kurdiyya xwa şermada dibe kû abonêmanên kovarê bi tenê sê (sise) kes in. Bi rastî wek (mîna) we nivisiye ; em zehf jêhatî ne !

Ez niha ji bona (bo) şes mehan dibim aboneman. Pişti şes mehan, heke riiknêن (şertên, hoyêن) min ên derwîlatî bi vî awayî (felri) bidome, ezê dîsan bibim aboneman.

Serketin, serfirazi û serdarîya we xebatkarêن kovarê dixwaza dile min e.

Brayêwe Bro

HEVALÊN HÊJA BERPIRSIYARÊN BERBANGÊ

Heta iro du hejmarê Berbang ketin destême. Dilê gelek welathêzen Kurdistan we şakir. Ji ber vê yekê ez we pîroz dikim.

Lê Neha çend gotinê min hene, ezê wana bînîvisinim. Iro BERBANG bi destê "Federasyona Komelên Kurdistan" li Swêd bi zmanê Kurdi tê çapkirin. Di elfaba Kurdi de, (1) (i) weka (i) ya tirkî, herfa (f) jî bî vî awayî (i) tê nivisandin. Bi bir û bawerîya min awaku hûn dînîvisinîn ne raste. Elfaba Kurdi dê sube çawa bê nivisandine, lazime ku irojî wer bê nivisandin.

Neha ez dikim ji Berbangê hejmar du (2), rûpel pênc (5) çend úşe bona xwanêkirinê bînîvisinim. "Leşkerên Israîl, kesen sivil ji esir digirtin" bi dîtina min lazim e ku em bêjin, "Leşkerên Israîl, kesen sivil jî digirtin". lazim e viya weha bê nivisandin..

Û ez helbest kî jî ji kovara Berbangê re birê dikim. Bi slavên Şoreşgeni. Serketina we herdem daxwaza meyi.

Bekes Hêvî

JI BO. BERPIRSIYARÊN BERBANGÊ

Dema kovara BERBANG giha destê min û min hundirê wê jî dît ku mîna navê xwe bi zimanê kurdî hatiye nivisandin. Dilê min gelek xweş bu. Hîvî darim kovar jî bi xweşî bidomîne. Sipas ji pêkvan û nivîsvanan ra.

Herweha ez vê helbesta xwe ya jorîn bi rêya BERBANG' ê jî gelên Kurdistan, ra diyarî dikim.

Siyabend

XORTÊN HÊJA

Nameya we hat, dibînim hûn ji hevkariya kaleki wek min narevin. Bê gu-man ez bi zanîna vê yekê dilgeşim. Ji ber xebateke lezxwaz û dirêj bersiva nameya we bi derengî ket, hêvîkarim ku careke din bersivên we zûtir bigehênen destê we.

Sed mixabin dema xort û li ser xwe bûm xebateke gelêr neket ber min. Gava iro ew rê li ber min vebû, ez xwe di koça jînê a paşîn da dibînim, ku nema bi kêtî xebatîne westxwaz têm. Ne iro, berî çar salan min qelsiya xwe nasi bû û holê ji lawê xwe yê ku li Awropa dimîne ra salix dabû.

Iro salêni min dibin heftê û çar, Qel-sim ne wekî par û par ne wek pêr. Roj bi roj bi şûnda diçe siheta min, bir û raman ji min tev bûn ser û bin. Destêni min dihejin û çok dirikrikin, En rewşa wan ev, ma ci dikarin bikin ? Mixabin nema bi kêtî xebatê têm, Ya bi min bibe berî nedim rêya kêm. Qasî bikarim gelê xwe bikim hişyar, Tu caran destê xwe nexim destê neyar.

Tenê ya dilê min ges dike ew e ku dirêjiya 56 salan têkoşîna min ji bo pêkanîna xebateke gelêr bû. Ev e ez dibînim ew awayê xebatê ku min dixwest iro li pêş gelê Kurd e û lawêni gel ên serbilind bi dîlxweşî pêda diçin. Bawerim ku di pêşendeyek ne pir dûr da, hemî dûşen kurdi çawan iro ji bo zimêni bi hevkarî û yekdestî dixebeitin,

ji bo welêt ji welêt xebata xwe bikin yek û bi ramaneke xweser bixebeitin.

Di meha pêş me da nivîsara ku ji Berbangê ra bişînim dê li ser elîfbîya kurdi be.

Silav û qencîxwaziya min ji we bîr-yên ku bi derxistina Berbangê mijûl dibin ra.

Osman Sebî

HEVALÊN RÊYA XEBATÊ

Dijminê devbexîn be hovîti Kurdistan çar parçey kirine. Hebûna Kurde me be sed salan talan dikin, gelê me kirine nava xezanyê û nezanyê, çanda gelê me ji qedexekirinê. Iro ku kovar û rojnemê Kurdi li walatê Avropaê dertê, geleki kêrhatînê bona gelê me. Kovar û rojnemada ser tarixa Kurda msalê têne neşerkirin, ulmdar û agelbendêne me nîta xwa debêjin. Xwandevan ji nasya xwe didine (tarixa) mîjûû gelê me û ku bar dibin, waki ew je meletê Ahmedê Xanînê, nevyê Salâhidînê, Ayûbinê û neviçrê Feqî Teîrane. Borçê intiligensyameye waki (selseleta) reşte çahelra bêjen ka em kine. Ka şaşyê me çe bûne waki em gehîşteni evê rojê.

Beraêd hêja, hûn ji wak pêşmergêdmeye merxwas şer dekin, hun şere gelêmê dikin. Waki merev be agheli şere gelêmê beke, ew hezar tor u çerberxana gewatere. Xebat wa wê qeve gelê çotkar û karkêra veke. Braen hêja, ez kubarîn ku hûn kare walêt dikin. Hûn wusa ji zman û çanda kurda pêşda dibin. Em bawarin ku "Berbang" ji wê wak kovar û rojnemê din hertim deng û behsan ji Kurdistanê begihine me, usa ji we rêya têkoşîna gelê Kurdistanê da xebateke pir hêja pêkbîne.

Glê "Berbang" ji halê Kurdistanê çemkî hê gelê me azayî dest neanîne. Bera zûterekê steyrka sebê (Gelavej) le ezmanî Kurdistanê beceruse û sebeke xer li ser gelê me vebe. Bera tev ji pençê xwe bavêje ser herçar parçê Kurdistanê.

Hesenê Üso

BÝAK KERÉ

FIRAT CEWHERI

SJAN

Osmán xwe keligiri kír û ji diya xwe re got :

— Daye, ji min re sindoqekê bikire ez ê ji xwe re boyaxê bikim û dirav bídím hev.

Diya wi lê vegerand û got :

— Lawé min, tu nikari, tu ê çawan boyaxê biki ?

Osmán xwe hebki delali kír û got :

— Wele ez dikarım bikim. Çima kincén lawé ciranê me xweşik in û solén wi nûne, yêñ min kevn in ? Ez ê ji xwe re boyaxê bikim û ji xwe re pê kincan bikirom.

Diya wi stuyê xwe xwar kír û bi keser got :

— Lawé min, bavê te çuye kar. Ew ê cejna qurbanê vegere malê. Hingi ez ê ji lawé xwe re qatek kinc û cotek solén xweşik bikirom.

Lê Osmán disan qebul nekir. Herdu lingén xwe li erdê xist, keligiri bû û got :

— Na, na ! Wele tu ji min re kincan nakri. Tu ê wek par bêje ku "Em ê pê kiryâ xêni bîdin û ji xwe re pê genim bikirom."

Diya wi ber bi wi çû, hembêz kír, maç kír û got :

— Bi soz, ez ê isal ji lawé xwe re kincan bikirom.

Lê Osmán jê bawer nekir. Ji ber ku her sal digotin "Em ê ji te re kincan bikirom." Lê nedikirin, Cejna Remezanê gava ku Osmán û zarokên hevalên xwe li malan li şekir genya bûn, hevaleki wi nehiştî bû bi wan re bigere, dehfek dabûyê û gotibû :

— Bi me re negere. Kincén te pinekiri, solén te qetiyayi ne û lêxistibû.

Osmán ji hingi ginya bû, bazdabû malê û bi ser diya xwe de qeriyabû.


Gava ku ew tişt dihatin bira Osmán, Osmán hin bêtür bi ser diya xwe de diqeriya.

Diya wi ji ber nekir der. Rabû ser xwe û ber bi kulinê meşi. Ji kulinê desten xwe xist nav lihêfekê, perê xwe yêñ ku di nav kevnekegi gîrdayi bû, derxist û du heb pelén deh wereqeji jê

derxist. Paşê ew desmalka xwe gîrêda û disan bir xist nav lihêfê. Bist wereqen ku derxistibû direji Osmán kír û got :

— Ha ji te re lawé min. Here ji xwe re sindoqekê bikire.

Osmán ji kîfan dikiri bifurya. Hema bi herdu destan êrişî wan peran kír. Lê gava ku bi tenê biçüya ser xerêt, dibû ku apo Ehmed jê re sindoq çênekira. Ji



ber ku hin zarok bû. Di bû ku apo Ehmed baweriya xwe pê neaniba.

İcar li ber diya xwe geriya û bi stu-xwari jê re got :

— Yadê ! Ma çi dibe lê, bi min re were ser xerêt bila zûka ji min re sindoqekê çêke.

Diya wi lê nihêri û dilê wê pê şewiti nexwest kukefa wi bışkine û got :

— Xwe ragire lawé min, ez hevir bikim, ez ê bi lawé xwe re werim ser xerêt.

Osmán lê vegerand :

— De yadê qurban. Zûka hevir bîke.

Diya wi, rabû çû teşta hevir derxist û bir da ber kisê êrd. Sê çar mist ard

berda binê teşte û rûnişt hevir kír.. Lê Osmán tebatî nediketê. Lâ dora diya xwe dîda lotikan. Geh av bera ber desten wê dîda, geh ji hevirê ku ji teşte dipekiya dîda hev û dixist teşte.

Diya wi hevirê xwe qedand, kevnekek avêt ser û teşta xwe dani quncikekê. Osmán hin ji vir de wê de baz dîda. Hema digot : "Zû yadê !"

Diya wi ji ew qet nedîkand. Her ku wi digot : "Zû yadê !", diya wi ji digot :

— Erê yadê bi qurban, em ê herin.

Diya wi, pişti kû hevirê xwe dani quncikekê, dawa xwe dawşand, desten xwe şuşt û ji Osmán re got :

— De haydê lawé min, em herin, beri ku bibe evar.

Osmán, desten xwe avêt kirasê wê û derketim. Mala wan li qiraxa bejér bû. Çemeki mezîn di ber mala wan re derbas dibû. Gava ku dibû zivistan, ew çem carna radibû, ava wi pir dibû, dibû wek lehikê. Lê niha havin bû. Av di çem de bi delkan diciû. Roj dijwar bû. Ji germa leylan rabûbû. Heke mirov satilek ava cemidi daniya ber tavê, ew dê di hundîre pênc deqiqan de bikelîya. Di wê germê de Osmán û diya xwe ber bi bajér dilezandin. Osmán hin ji dawa diya xwe bernedabû. Te digot : "Qey dê diya wi ji destan bazbide." Desteki wi bi kirasê diya wi vebû û desten din ji li ba dîkir. Gava ku çem xelas kîrin, Osmán xwe avêt pêşîya wê û got :

— Yadê, ez ê bêjim,

Boyax, boyax ! ..

Apo, boyax ! ..

Xalo, boyax ! ..

Ez solan dibiriqinim !

Gen hûn xwe tê nebinin,

Çerxiki ji nedine mun !

Ji bo ku ez peran pir bídím hev û ji te re ji huburyekê bikirom.

Kêfa diya wi ji van peyvîn wi re hat, daqul bû, maç kír û got :

— Aferin lawé min. Lawé min jêhati ye. Lê, tu û zarokên xelkê li hev nexin haa ! ..

Osmán got :

— Na, na !

Riya xwe nêvi kırbûn. Bi qasi bist deqiqan mabû, ku bigihan ser xerêt. Lê roj hin germtir dibû. Mirov digot, qey agir bi erdê ketiye. Osmán û diya xwe di xweydanê de mabûn. Lê qet xema Osmán nebû. Hin ji, desten wi bi kirasê

diya wi ve bû û xwe li ba dikir. Édi ketin nav bajér, xwe dan kèlekeke dikanan û xurt meşyan. Dikan bî rêz bûn. Lî ber hin dikanan sindoqên bacan, isot, fîringî û pivazên şin hebûn. Lî ber hin dikanan ji, tayêr rengo mengo bî dar de kiri bûn. Osman û diya xwe her dîmeşyan. Beri ku bigîhîjin ser xerêt, bî çar dikanan, Osman got :

— Dayê, dayê, ka binêre !

Tu nabê hin zarokên boyaxkêr ditibû. Diya wi sekini û li wan zarokan nihêri. Çar zarok bûn. Herçaran ji sindoqên xwe li pêşîya xwe dani bûn û rûniştibûn. Lî yeki ji nav wan çîgas xweş dikir. Gava ku wi firça xwe li sindoqê dixist, mirov digot qey ew li tembilkê dixe. Wisan xweş lê dixist. Hema Osman li firça wi û li sindoqa wi dinêhêri, eger bî ya wi ba, ew ê li wir pîrimana. Lê diya wi destê wi kişand û got :

— Zû lawê min, êvar e, ançax em bigîhîjin.

Osman xwe piçki delal kir û got :

— Yadê, ez ê ji karibim wisan bîkim ?

Diya wi, serê xwe kil kir û got :

— Erê lawê min ! Tu ê ji hin bîbe.

Ew meşyan, ketin nav dikanañ xeratan. Çavêñ xwe li dikana Hoste Ehmed gerandin. Hoste Ehmed, desteburakê bavê Osman bû. Demekê wi û bavê Osmân, bî hev re qaçaxi dikirin. Pir caran hatibûn girtin, pir caran ji ji mirinê filiti bûn. Rojekê ji, gava bî şev li tixûp dixin, bî lingê Ehmed de bombe diteqe. Ji wê roje bîvir de, dev ji qaçaxê berdîdin. Bavê Osman, her havin diçû bajarêñ mezin û li wê kar dikir. Ehmed ji, bî wan peren ku ji qaçaxê dabû hev, ji xwe re pê dikaneñ xeratîyê vekînbû û kar dikir.

Piştî çend dikana derbas kîrin, gîştin cem dikana Ehmed û derbasi hundır bûn. Hoste Ehmed, tenê dergûş çedikir. Bi qasî deh dergûşan li hundır hebûn û yek ji dî desten wi de bû çedikir. Hoste Ehmed, serê xwe hilda bani, por û bijangêñ wi, ji toza textan spi bûbûn.

Xatûnê rojbîxîrbûn dayê.

Hoste Ehmed :

— Wey tu ser, ser û çavêñ min re hatiyî, Xatun ! Kerem bîke derbas be !

Xatûnê derbas bû, xwe da ser textikeki û rûnişt.

Hoste Ehmed, şalawarê xwe dawşand û pîrsi :

— Èê... Xatûn, de ka bêje, bê hûn çâ-

wan in, Hûn ji bırakê min Mistô naman dignin an na ?

Xatûnê piçki dîn ji cihê xwe xweş kir û bersiv da :

— Erê wele kekê Ehmed, wi çendê berê nameke wi hat, dî nameya xwe de gotibû : "Ez ê bî beri cejna heciyan bî pênc rojan werim."

Hoste Ehmed :

— Nabîje karê wi çawa ye ?

Xatûnê :

— Xwedê zane, dî avahikê de kar dîke. Vê carê Osman, ji bêhna toza textan kuxuya. Bî kuxina wi re, Hoste Ehmed berê xwe pê ve kir û pîrsi :

— Èê Osmanke min, tu çawan i ?

Osman weki ku fedî kir, bî dengeki nizim bersiv da :

— Ez baş im, apo !

Hoste Ehmed, disan berê xwe bi Xatûnê ve kir û pîrsi :

— Xatûn, hûn ê kengi Osmân bîşinin dibistanê ?

— Bî xêr sala were, kekê Ehmed ! Mesrefa dibistanê grane, lê Osman dixwaze herê.

Hoste Ehmed, wa bî dengeki gur got :

— Na, na ! Lîewîk bîşinin ! Dibistan baş e Xatûn ! Bila ji xwe re bixwine, bîbe tişteki.

Kêfa Osman, wê biskê ji sohbetê re nedihat. Hema dixwest, ku deqekê beri deqekê sindoqa wi çêbibe, ji xwe re boyaxê bike û pê kîncan bikire. İcar xwest, ku bala diya xwe bîşine ser xwe, ziq li çaven wê nîri.

Diya wi, lê hayi bû. Zanibû, ku tebatî nakevî. Ji ber vê yekê, zûka ji Hoste Ehmed re got :

— Kekê Ehmed, riceke min ji te heye.

Hoste Ehmed, wa bî şaşmayi li çavêñ wê nîri û got :

— Kerem bîke, Xatûn !

— Osman dixwaze ji xwe re boyaxê bîke.

— Èê... ! ..

— Lî sindoqa wi tuneye. Em hatine nikte, ji bo ku tu jê re sindoqekê çêbibe.

Hoste Ehmed kenîya û got :

— Rice gişt ev bu, Xatûn ?

— Erê wele, kekê Ehmed !

Dî wê deme de, Osman ew bist wereqen ku pê re bûn, dirjî Hoste Ehmed kir. Hoste Ehmed, destê wi guvaşt û got :

— Na lawê min, ma ez ê peran ji te bishtinim ? Tu ji xwe re bî van peran firçe û boyaxê bikire. Lî piştî du rojên dîn were sindoqa xwe bîbe.

Piştî ku Hoste Ehmed weha got. Xatûnê nizanibu, ku bî çi awayi sipasên xwe jê re pêşkêş bîke. Lî piçki hızır û wa bî stuxwari got :

— Xwedê ji te razi be, Xwedê kemasiyê nede te, kekê Ehmed !

— Tu çi dibêji Xatûn ? Min û bavê Osmân tam deh salan bî hev re kar kîriye.

Xatûnê disan got :

— Xwedê kemasîya te nedê !

Paşê rabûn ser xwe û destûr ji hoste Ehmed xwestin. Hoste Ehmed rabû ser xwe û bî wan re derket heta bî devê deri.

Osman û diya xwe ji Hoste Ehmed xatîr xwestin û beri dan malê. Piştî ku du roj derbasbûn, Osman disan çû cem Hoste Ehmed. Hoste Ehmed sindoqa wi çêkiribû. Jê re qayışek ji lêxistibû. Osman qayışa sindoqa xwe avêt stuyê xwe û bî lez ji dikanañ derket. Gava ku Osman çû, Hoste Ehmed bî du wi de bang kir :

— Osman, Osman !

Osman lê vegerand û got :

— Çi ye, apo !

— Binêr lawê min, li xwe miqate be, tu nekevi ber tu makinan haaa ! ..

Osman bî dengeki bilind bersiv da û got :

— Na, apo ! Na !

Ew ber bî dikana boyaxê çû. Ji xwe re firçe û boyax kîri. Çû li cem zaro-kîn boyaxkêr runişt û bang kir :

Boyax, boyax ! ..

Apo, boyax ! ..

Xalo, boyax ! ..

Ez solan dibirûqinim !

Ger hun xwe tê nebinin,

Çerxiki ji nedine min !

Hema zılämeki dirjî, bî navpi, sola xwe dan ser sindoqa wi û got :

— Zû birazi, qondara min boyax bîke, beri ku makine here !

Osman firçe û boyaxa xwe derxist û got :

— Apo, niha dî deqekê ded boyaxdikim. Piştî ku qondara wi boyax kîri, mîrik du wereqen avêt ser û çû. Osman ew du wereqen xwe avêt çavika sindoqê û got :

— Ev sıftek e.

Heta bî êvarê, panzdeh wereqen kar kîri. Hin ji boyaxa wi bî têra du rojan mabû. Beri ku here malê, çû dikanañ qevdek pivazê hêşin kîri û dû re berê

xwe da malê û lezand.

Diya wi di ber kuçik debû, agrê bin beroşê tev dida. Osman, beri ku têkeve hewşê, bang diya xwe kir :

— Yadê, yadê !

Diya wi rabu ser xwe û bi kêf got :

— Tu hati, lawê min ?

Osman ji kêfan devê wi nediket hev.

Wi ji bi ken got :

— Erê yadê, binêr ! Va min pivaz ji kiri û hin çarde wereqê ji bi min re hene.

Diya wi ber bi wi çû, ew maç kir û got :

— Aferin lawê min ! Lawê min dê ji xwe re pê kincan bikire.

Paşê qevda pivazan ji dest wi girt û çûn hundir.

Kincen Osman, dest, ser û çavêni wi di boyaxê de mabûn. Diya wi kincen wi jê kir û bi ava cemidi serê wi şuşt. Paşê şalwarki qutik û vezelki milkurt lêkir.

Şev êdi tari bû. Wext bû wextê şivê. Diya Osman rabû çû şiva xwe ji ser êgrî daxist, xist firaxekê û ani dani ser sıfrê. Paşê ban Osman û birayê Osman ê piçük kir û li ser sıfrê rûniştin û xwarina xwe xwarin.

Osman di ser şivê de, surf qala xwe û boyaxa xwe kir. Tew bi ya wi bûya, wi dê birayê xwe ê piçük ji bi xwe re bîbirâ. Lë, diya wi nehişt û got :

— Na, lawê min, hê Hesenkê min pir piçük e, Kengi ew ji wek te mezin bû, hingi bila apê wi Ehmed jê re sindoqe-kê çebike û ew ji bi lawê min re were boyaxê bûke.

Osman şireta diya xwe qebûl kir û lê vegerand :

— Dayê, gava ku kekê min ji bi min re were, hingi em ê pir peran bidin hev û emê ji bo dibistanê ji xwe re pê pirtük û penûsan ji bîkirin.

Diya wi disan keser berda û got :


— Erê, lawê min ! Hun ê ji xwe re pê her tiştî bîkirin.

Paşê rabû ser xwe, çû nivinê wi li erde raxist û ban wi kir.

— De Osman, were razê, ji bo ku tu sibê zû rabi, lawê min.

Osman, hema ji cihê xwe hol bû, çû ket nav nivinê xwe û raza.

Bî rojhelat re rabû ser xwe, ser çavê xwe şuşt, xuriniya xwe kir û rahişt sindoqa xwe, avêt milê xwe, berê xwe da sükê û çû li cihê xwe ê berê rûnişt. Heta bi nivro kar kir.



kir, paşê çû ji xwe re perçek nanê firêne û çend li bî zeytûn kiri û hat li ser sindoqa xwe rûnişt û xwar.

Wê rojê sük pir qerebalix bû. Nema-ze, ji gündan pir mirov hatibûn. Yê mast anibûn ji bo firotinê, yê hêk û yê barê êzingan...

Ji bili wan ji, ew roj, roja çûna eske-riyê bû. Sük tije xort, kal pir û zarok bûbû.

Wê rojê Osman, tam bi sih wereqi boyax kir. Beri ku tari têkeve erdê, rabû ser xwe, a sindoqa xwe avêt milê xwe û berê xwe da malê. Gava ku gi-haşt malê, hin roj bi qamekê bîlind bû. Diya wi şaş ma. Ji wê turê, belene ha-tine serê wi. Lë gava ku gihaşt cem, Osman keniya, diya wi xwe negirt û pîrsi :

— Xêr e, lawê min ? Çîma tu weha zû hati ?

Osman destê xwe avêt bêrika xwe, si wereqê nişani wê da û got :

— A ez ji bo van zû hatim, dayê ! Ma qey ne bes e ?

Diya wi nû ve ruh pê de hat. Wê sindoqa wi ji mulan kir û bi hev re meşîyan malê. Paşê şiva wi dani ber, li cem rûnişt û bi stuxwari jê re got :

— Osmankê min !..

Osman sere xwe rakir, pariyê ku di dêv de bû, cût û got :

— Çi ye, dayê ?

— Lawê min, sibê şuşa gazê bixwe re bibe û ji me re gaznê bikire !

Osman disan kevçik li xwarinê xist û got :

— Bila dayê, bila !

Disan dest bi xwarina xwe kir û xwar.

Ew şev di ser wan de derbas bû. Si-bê zû Osman rabû ser xwe, wek her car ser çavê xwe şuşt, xuriniya xwe kir û rahişt sindoqa xwe, avêt milê xwe û çû li cihê berê rûnişt. Heta bi nivro kar kir. Paşê nihêri ku cipek sekini û çend zılamana xwe je avêtin. Gava ku wan zılamana xwe avêtin, zarokên li cem Osmân gişan baz dan. Lë, Osman şaş ma. Nizanibû ku çi ye, an ji bo çi heva-len li cem giş reviyan. Hin wisan dihi-ziri, dit ku yeki bi milê wi girt û şima-qek li xist. Paşê pehinek li sindoqa wi xist û got :

— Hey bêji, lawê bêjiyan ! Ev çend carin ku em dibêjin "Lî vir boyaxê nekin !"

Hingi Osman fehm kir, ku ev çawişen belediyê ne. Hema rahuşt sindoqa xwe

EVE SONDA MİN

Dûr ketime ji welat
Ji dil û kezeb
Axînê n kûr dikşinim
Bêriya welat di dilê minda şax daye
Ax welat ax welat
Welatê şêrîn
Bihişa rastin
Min çawan tu hêştif
Bûme dereke li welatê biyan
Lê min te navê tiye
Min te ji bûr nekiriye
Û nakim jî
Tu timî li bîra minî
Lê ax çibkim
Ew destê sitemkar
Ew destê xwîmrej
Destê ku bi xwîna Şêx Seîd
Bi xwîna bijîşk Fuâad
Bi xwîna bavê Tujo
Û bi xwîna gelek lehengê n din buye sor
Min ji te avê tye der
Lê bila baş zanibe
Ev dijminê xwînmij
Ev dijminê mirovxxwar
Ku tu serdestî û zor
Min ji xebatê nake sar
Û ci nêz ci dûr
Ezê bixwînê bighîm te
Wek Vietnamîyan
Kamboçyu Kubîyan
Ezê te ji dijminre bikim turb û gor
Û ezê
Ji nûda vejînim
Şex Seîde kal
Bijîşk Fuât
Bavê Tujo
Û bi hezaran rewanpakê n bê nav
Ezê rûnim li ser lat û zinarê n te
Ezê hewayê pak û paqîj
Bikşinim kezaba xwe
Ezê guhê xwe bidim xumxuma avan
Şirêna çiravan
Xuşe na daran
Qibe qiba kewan
Viçe viçe çîvikan
Û dengê şalûr û bilbilan
Û ezê temaşe bikim
Li nêrgiz û sosinan
Sinbil û beybûn û benevşan
Li pirpizek û nesrin û sorgulan
Çawan dipişkîfin û dibîşirin
Û ezê têr binêrim
Li mîrg û çîmen û gihayê renga reng

Ku çawan wek xalîşan
Welatê min xemilandine şeranser
Û bi xwezi
Ezê bala xwe bidim fîstan soran
Dêm bedew, çavreş û bisk xelekan
Çawa disemin
Û bi herdengî sitranê azadiyê dibêjin
Ax welatê min
Raste rast
Min ji te dûrxistine
Berê min dane biya ciyan
Lê min ji te nekirine û nakin
Bi sîpan û tendûreka te
Bi şengal û sefina te
Bi terame û ji bo teme
Û her û her
Ezê ji bo te bim
Tu wî rehê jina min
Welatê min
Bawer bike ji min
Eve sonda min

*Her weha bike ku ez ji virûhada
Hinekê hin te spaskim.*

*Rista mina derengketi.
Mêjokê şox piroz dike
Bila li bin basken hemû
Periyen erd û esmana dilovanbê.
Ê bi bavekê hêjabê.
Wek dayika xwe ê çeleng û bengibê.
Bila giyana wi mengbê.
Li ser rastiyê bila sertbê, wek periyê/
Herûvimbê,
Bila nizanibê heya roja dawiyê
Kul û azarêv evine
Û ne şanaziyen birêv pûç û mîqrîs,
Bila binêre bi dilek
Li çiriskên xapan û rip
Li virûvitên cihanê
Bila negerê li hoyen
Kewjên xwe, li keb û meraqen begane
Bila bazi jî tariyên dewlemenda,
Giyân sîpîbê û dûşadbê
Û ne şanaziyen birêv pûç û mîqrîs*

Zinar Şiro

SPAS

M. LERMANTOV
Wergerê ji Rûsi : R ê z a n
Ez te spasdikim ji bo hemû tıstan
Ji bo nihêniya kulen pir arezû,
Ji bo rondikên tal û maçén jehrayi
Ji bo tola dijminan, bedbextên dostan
Ji bo germa havila belabûye li
Kerbeleni
Ji bo her tişten ez pêhatim xapandin
li jitanê


Dûmahika "Boyaxkerê Solan"

û ji dest wi baz da. Çawiş da dû. Di vê navberê de, texsiyek ji jor de bi xurt dihat. Texsiya ku bi xurt dihat ji nişkê ve li nav guhê Osmen ket.

Tenê dengek ji Osman derket, dengeki bi qerin. Esnaf, nanopêj û barkêşen wê dorê tevde baz dan, hatin ser Osman. Niherin, ku sindoq boyax, firçe û şûşa wi ya gazê her yek bi derrickê de belav bûne. Osman di nav tekeren texsiyê de bûye nanık.


TU BÜKA SERXELİ

Tu bûka serxêli	Deşt û ciyan	Kesk
Bejna selvi	Vê payizê	Sor
Xemiliye bî ala rengin	Lî niştiman	Û
Kesk		Zer
Sor	Xemiliye	Bî xwina pê şengan
Û	Berfa sîpi	
Zer	Lî zozanan	Hewar ne ke
	Çavkaniyê zelal	Jî bê kesiyê
Tu bûka serxêli	Mêrgen berwaran	Bûka serxêli
Guliyê reştari	Zinarê asê	Hewar ne ke
Ser singa gewsipi	Xemiliye	
Tu evindara	Bî xwina	Keçen te hene
Pêşengen	Keç ü xorten ciwan	Xorten te hene
Niştiman	Avdan	Lî Mehabad
Dirêje xwin	Ajdan	Bokan û Sernandec
Dibare agir	Kulilikên	Şoreş Zirek





XACEREZ



ÇEPEAST

- 1- Hesret. - Lı hinek ciyan ji çakûç re dîbêjin.
- 2- Din, mezheb. - Lı ser milê hemalaye (berepaş). - Hejmarek (berepaş).
- 3- Lı hinek ciyan ji dewarên du sali re dîbêjin, lê bî taybeti tewirek berana ye (berepaş). - Tayek ji por. - Bangek ku ji bo mîran (berepaş).
- 4- Kesê ku nikane biaxife, bê ziman.
- 5- Dî serihildana 1925 an de serokatiya serihildanê kir, lê dî pêre ew û 47 hevalêni wi dî 4 ê ilona 1925 an de bî destê mîtungekarêni tîrk ve bî awaki hoviti li Diyarbekrê hat kuştin.
- 6- Lı hinek ciyan jê re "heb" ji dîbêjin, her weki hebek tîrî, hebek genim - Gava ku mîrov serma dîgre pê dikeve.
- 7- Diroknasê Yûnani yê bî navû-deng, ku dî pîrfuka xwe de bî her awayi qala Kurdan ji dîke. - Kesê jîr, alîm.
- 8- Bî zaravayê Sorani "lê, feqet". - Dî Kurdi de pê şpirтика pîrsê û her weha dî maneya "gelo, qey" de ji tê bîkaranîn. - Jan, acizi, elem
- 9- Büyerek xuzayê. - Bî zaravayê Dîmili ji kesen din re tê gotun.
- 10- Tewirek nexweşiyê "sitma" (berepaş). - Rengek. - Mûyê wecê mîrovan. - Kesê bê av mayi.

SEREJÊR

- 1- Bî zaravayê Dîmili ê zing, li hinek ciyan jê re "izim" ji tê gotun. - Talaz, babelisk û firtone bî wê pêk tê.
- 2- Axaftina telefonê (berepaş). - Tevger, hereket, dî maneya "uzuv" de ji tê bî karanîn.
- 3- Çuwâlê mezîn, bî taybeti dî ka kışandînê de bî kartinîn.
- 4- Agr. - Bê pere.
- 5- Dî axaftinê de menfi. - Ciye ku tê de genim dîhêrin. - Xwarinek ku ji genim (dan) çê dîbe.
- 6- Dî şûna erê de tê gotun. - Dî Fizigê de qanûnek.
- 8- Xwediyê Tewratê. - Beg, axa.
- 9- Ne buhayî, dijitiya buhayiyê.
- 10- Gava ku bênder li ba dîbê genim dî ci de dimine ew diçe (berepaş). - Dî Quranê de sûreya jinan.
- 11- Bî zimanê Latinî nu. - Cihan, gerdûn.
- 12- Qertel. - Paytextê Sûriyê (berepaş).



YOL, BI NAVEROKA XWE, BI DİYALOGÊN XWE, BI MUZIK Ü WENEYÊN XWE FILMEKE KURDİ YE.

YOL, JI JİYANA ROJANE YA KURDISTANÊ, BI TAYBETİ JI JİYANA KOLEDARI YA JİNÊN KURD, GELEK TABLOYÊN DIJWAR, BI RENGEKİ TUND Ü ZELAL PESKÊŞ DIKE.

DEMA MIROV TEMAŞA YOLDIKE, DILÊ MIROV BI HÊVIYA KU DI ROJÊN PÊS DE, LI SER KURDISTANÊ GELEK FILMÊN WEHA BÊTIN ÇEKIRIN, TIJI DIBE.

YOL, PARÇEKİ JI RELİTA KURDISTANÊ RABERİ AWIRA GELEMPERİ YA CİHANÊ KIR, BALA RADYO, TV. ÜROJNAMEVANÊ HEMÜ WELATÊN EWRÜPA KİŞAND.

LÊ ZIRAVÊN MÊTINGEH-KARÊN TIRK JI QETAND. JI BER KU EW NIKARIN HEBÜNA FILMEKİ KU REALİTA KURDISTANÊ RÊDIDE Ü BI SER DE JI BI MUZIK Ü BI ZIMANÊ KURDİ YE, DAQURTININ. EGER TEHEM-MUL NAKIN, BILA SERÊ XWE LI HEFT DİWARAN BIXIN!

YILMAZ KURD E, HELBET WÊ FILMÊN Wİ Jİ LI SER KURDISTANÊ BIN.

YOL TEMAŞE BIKE Ü BI HEVAL Ü HOGIREN XWE BIDE TEMAŞE KIRIN!




HER EÜAR LI SİNEMA
FILMSTADEN
û GRAND



YILMAZ GÜNEY





Bi Kurteburi _____
Jinek bûri, çû, bê yar û welat
Wek din û sewda, wisa mit û mat
_____ Rojen Barnas

Foto : Ann Eriksson